

welat

Sal:2 Hejmar:103 6-12 Reşemî 1994 10.000TL (KDVD)

Rojnameya Hefteyî

*Li ser kurs û dersên
zimanê Kurdî
endamên DEP'ê
çi difikirin?*

Rûpel 6



Di doza girtina Welat de

Dewletê Kurdî nas kir!



Di Salona Dadgeha Ewlekariya Dewletê ya Stenbolê de, Berpirsiyara Nivîsaran yê Welat Mazhar Günbat, di destpêka danîşînê de bi Kurdî wiha got: "Ez berpirsiyarê rojnameyeke Kurdî me. Xweparastina bi Kurdî mafê gelê Kurd ê herî xwezahî ye."

● Doza girtina Welat bû destpêka pêvajoyeke nû ji bo zimanê Kurdî. ● Di danîşînê de gelek caran peyva Kurdî ji aliyê dadger ve hate bilêvkirin. ● Berpirsiyarê Nivîsaran Mazhar Günbat bi Kurdî pirsên dadger bersivandin û daxuyand ku bi Kurdî wê xwe biparêze. ● Dadgerê DED'ê pêşî li hember axaftina bi Kurdî derket, paşî biryar da ku danîşîn ta 5'ê Avrêlê bê taloqkirin. ● Danîşîna yekemîn a doza girtina Welat wek destpêka pejirandina hebûna zimanê Kurdî hate nirxandin. ● Cara yekemîn e ku di danîşînekê de li hember axaftina bi Kurdî, dadgeheke Tirk biryara peydekirina wergêrekî zimanê Kurdî dide. ● Nivîsên Welat ên ku bûne mijara dozê, ji aliyê kesekî ji wergêrxaneyê DE-VA hatiye wergerandin. ● Emê der heqê DE-VA de dozê vekin ji bo ku jê bipirsin ka li gor kîjan qanûnî wergêrekî zimanî Kurdî ji ku aniye û çiqas pispor e di vê hêlê de. ● Piştî vê danîşîna doza girtina Welat, tê hêvîkirin ku ji niha pêve hemû Kurdên welatparêz di dadgehên de xwe bi zimanê xwe yê zikmakî biparêzin.

Rûpel 8

Ê ku Welat nexwîne zilmê li xwe û Welat dike

Ez berî hemû tiştî ji şer-
vanê gel hevalên girtîge-
han û xebatkarên rojna-
meyê re silavên germ bi rê
dikim.

Erê min gotibû ên ku
Welat nexwînin zilmê li
xwe û Welat dikin. Xwezî-
ka ên ku Welat naxwînin
zilma wan li wan tenê bibû-
ya, lê çi fêde zilma wan
serê pêşî li zimanê wan li
welatê wan û li gelê Kurd-
istanê tê kirin. Xwe înkâr
dikin, dibêjin em ne Kurd
in. Em di bin ala Tirkan de
mezin bûne û sed derbî,
hezar derbî, vê şitexaliyê
dibêjin, qet fedî nakin ji dê

û bavê xwe, ji gelê xwe, ji
jinên xwe, qet fedî nakin,
perda rûyê wan wek ê Hî-
koçeto qetiya ye. Mirov tif
li ser rûçikê wan bike wê
wek cerdevanan herin li
şorbê bigerin. Tu dibê qey
demara Kurmancan di wan
de ne geriyaye, ewqasî
xwe înkâr û xwe rezîl dikin.
Ji qewlê apê hêja Apê Mû-
sa; "Erê lawo ma qey nayê
bîra we heya doh we
newêribû bigotana em
Kurd in. Lê îro hûn fedî
nakin ji xwîna şehîdan,
hûn dibêjin em Kurd in, lê
em di bin ala Tirko de me-
zin bûne. Hûn baş zanibin

hûn ne mezin in hûn pûç
in pûç." Mêzekin cerdeva-
no û nexwendevano (yanî
ên ku zanin û Welat naxwî-
nin) eger Rebê-alemê we
efû bike hûn baş zanibin
gel û şervan we efû nakin.
Mêzekin eger hûn îro wê
şitexaliya ku hûn dibêjin:
"Em ne Kurd in" ji bîra ne-
kin, ew jî bi xêra şehîd û
şervanan hûn karin bibêjin.
Îca gel bang dike dibêje:
Bimire her kesî li dawiyê,"
werin bibin nemir. Berxwe-
dan jiyane.

**M. D.
Bavê Xalo**

Tîna xwe bi Welat bişkînin!

Qelemkêş û hunermendên rojnameya Welat;
Bi pêkanî û nexîşkirina rojnameyê, gelên
Kurdistanê hate xelatkirin, bi dîtina min. Ji
ber ku li tiştêkî wisa pirr û pirr digeriyan û bi
amadekirina xortên ji sînga gel pijiqîne
pêşniyarî wan bûye, hê jî ev tişt pirr li wan
xweş e.

Ên ku Welat dixwînin, xwendevanên dilo-
van; mîna li meha Tebaxê (Gelawêj) mirov bi
xwarineke şor têr bibe û bi piya ango peyatî
li riyeke dûr biherike ka mirov çiqas tî dibe,
dema mirov bigihîje kaniya ku ji quntara çiyê
derdikeve, ew ava cemedî çiqas xweş be,
pêwîst e ev rojname welê bi me xweş be. Çi-
ma? Ji ber ku em li hebûna xwe xwedî der-
nekevin çi ji dijmin hatiye bi serê me de ani-
ye, bi serê bavên me de jî û kalên me de jî a-
niye.

Lê îro em gav bi gav nêzîkî hebûna xwe

dibin, ew hebûna bi zarên me em bixwînin,
em binivîsînin û bi dibistan û aborî bibin.

Rojnameyê Welat gavek e di hêla çavnasi-
ya bi ziman û zargotinên me de, emê bi çar
destan xwe biavêjine û lê xweyî bibin. Bi
nêzîkbûna xweşî û dilgeşiyê bawer im.

Ahmet Argin

Helbesteke Ehmedê Xanî diyariyê we dikim

Ey derîxa mame تنها ez di şemsa xawerê
Xan û man tşk bûne zulmet paşî wê dîm

Paşî lêvê wê venaxwim mutlaq ava kewserê
Min navê dunya bi carek paşî wê sîmên berê

Ger bizanim ez di heşrê de nebînim dilberê
Cenetê dê pê çikem pê wer bikem xakisterê

Leşker û guhdar

Di 15.01.1994'an de ez li otobusa Metro
Turizmê saet li dora 12.00'an siwar bûm.
Di otobusê de xortekî ku li Şirnexê leşkerî
dikir hebû. Ji wî xweş dihat fêmkirin ku ew
ne li hemdê xwe ye (Aqilê xwe çelqandibû).
Jixwe wî jî digot ku nerehetiyê wî ya psî-
kolojîk heye, hatiye Enqerê û destûra bet-
lehê wergirtiye. (Ji hevalê ku li nik wî rêvanî
dikir re digot)

Gotinên wî mirov dibizidandin. Cenga li
Kurdistanê bi devê xwe, bi awayekî aşîkar
şrove dikir. Gotinên wî çawa min bihîstine
ez eynî dinivîsînim:

"Rojekê em bi terorîstan re ketin şer.
Em di çihêkî de asê kirin. Em 7 leşker bûn
gulle weke baranê bi ser me ve dihatin. Me
nikaribû xwe bilebitanda. Di çentê piştan de
çekên kîmyasal hene, lê em nikarin xwe bi-
lebitînin ku em çekan bikar bînin. Ji ber ku
dibû ku berekek îsabet bikira. Piştî demeke
dirêj me bi bêtêlê alîkarî xwest."

"Dîsa rojekî me êrîş bir ser gundekî, me
gundî pirsîyar kirin. Jê re got: Alîkariyê
nedin terorîstan û me ew tehdît kirin. "Baş

e, lê dê kî me biparêze" gundiyan got, rast
digotin. Em wek rîza dilê xwe diketin gund
û derdiketin. Me gundî pirsîyar dikirin û çi
tiştê me dixwest me dibir û diçûn".

"Kuştina mirovan li wir zehf hêsan e.
Ez mirovekî bi malbata xwe ve girêdayî me.
Her roj min telefonî malê dikir. Lê li wir mi-
rov malbata xwe jî, ji bîr dike. Tenê yek fik-
rekê mirov heye ew jî kuştina însanan e.
Rojekê, me 15 kes kuştin, di nav wan de pi-
rek jî hebûn. Min gelek gundî girtin di nav
wan de zarok jî hebûn. Me ew birin qere-
qolê tu tişt negotin. Qomandêr got: "Wan
serbest berdin bila herin," wateya gotina
qomandêr "wan gullebaran bikin" bû. Min
û hevalê xwe yê leşker berçavkên Morîzîer
(Morötesi) dan ber çavên xwe, zarokêkî û
gundiyekekî em dîtin. Me tiliya xwe dan ser
tefîkê, me ew dan ber gullebaranê, tev kuştin.
Li cem deviyê me çal veda û ev naştin"

Piştî van gotinên xwe, li nêzî Kizilcaha-
mamê jî otobusê peya bû.

Zelal Parêzyar / İstanbul

Nivîsara Welat

Emê li mafên xwe bigerin

Di pêvajoyên şoreşan de, di demên ku civak bi
tevgerên şoreşger vediguhere, rewşên nû xwe
didin der. Vîtêsa guherîna civakê bi giştî, bi xurtî
û dinamîzma tevgerên pêşverû ve girêdayî ye. Ev tevger
çiqas xurt û bi tesîr bin, mercên civakê jî ew çend zû digu-
herin û demên nû derdikevin holê. Di hin deman de civak
di deh salan de, ji sed salên demên din zehftir diguhere.

Di pêvajoyên welê awarte de her tim qala demên nû tê
kirin. Li Kurdistanê hêza tevgera azadiyê gihiştîye qona-
xeke welê bilind ku ev hêz her meh, carina jî her hefte di
civakê de şertên nû diafirîne. Di pêvajoya da salên dawî
de wek rojnameya Welat me gelek caran qala demên nû
kir. Pirr caran di nivîs û heta di manşetên xwe de me beh-
sa destpêka demên nû dikir. Dibe ku ev yek bala xwende-
vanên me dikşîne û wek tekrar ji wan re xuya dike. Lê
divê bê zanîn ku demên nû yên em behsê dikin, ne tekrar
lê bi rastî jî guherînan ku bi tesîra tevgera azadiyê re tîn
afirandin in. Yek ji wan demên nû dîsa xwe dide der. Zi-

**Her çendî dewlet di warê
serbestiya zimanê Kurdî
de niha mecbûr maye û
tawîzeke girîng dide jî,
ger Kurd bi ser dewletê ve
neçin, ger rewşênbîrên
Kurd li zimanê xwe xwedî
dernekevin, ger berpîrsi-
yar û xwediyên sazî û we-
şanên Kurdî di dadgehan
de xwe bi Kurdî neparêzin
bi rastî, dewlet tiştê ku
niha di destê me de ye, ku
fersendê bibîne wê wan jî,
ji me bistîne.**

manê Kurdî ber
bi fermîbûnê ve
diçe. Hebûna
zimanê Kurdî ji
hêla dewletê ve
jî bi devekî fer-
mî tê pejiran-
din. Ev pejiran-
din ne rasterast
lê bi awayekî
şermoke û qa-
ba xwe nîşan
dide.

Lê dîsa jî ev
tewreke nû ye û
bi ihtîmaleke
mezin wê bibe
destpêka pêva-
joyeke nû ji bo
zimanê Kurdî.

Dewleta Tirk,
wisa xuyaye ku helwesta xwe ya li hember zimanê Kurdî
ji nû ve di ber çav re derbas dike û fêm dike ku nema di-
kare çavê xwe li ber vê rastiyê bigire, xwe mecbûr dibîne
bi awayekî, vê pirsgrîkê çareser bike. Bes dîsa jî bi awa-
yekî balkêş û tevlihev nêzîkî zimanê Kurdî dibe. Di pişt
stûyê xwe re destê xwe yê rastê dirêjî guhê xwe yê çepê
dike. Di şûna ku dewlet bi awayekî eşkere bibêje bila zi-
manê Kurdî êdî di her hêlê de bê serbestkirin, bi navgîna
DED'ê dozê derbarê nivîsên Kurdî de vedike, ji bo vê jî di
nivîsên resmî de cara yekemîn peyva Kurdî dide xuyaki-
rin, behsa wergêrekî Kurdî yê sondxwarî dike. Kî çawa di-
nirxîne bila binirxîne û niyeta dewletê çi dibe bila bibe, ev
tewra DED'ê ku yek jê sazgehên dewletê yên herî paşve-
rû ye, bi devekî fermî pejirandina zimanê Kurdî ye.

Helbet, em vê tewra dewletê ne wek lutûfekî dinirxînin.
Li hember têkoşîna Kurd a neteweyî dewlet mecbûr maye
dev jî wê helwesta ucûbe ya li dijî zimanê Kurdî berde.

Bes, tiştêkî din î pirr girîng heye ku divê bi girîngî li ser
bê rawestî û di ser guh re neyê avêtin. Ev jî tewra me
ye, tewra rewşênbîr, sazî û weşanxaneyên me ye. Her
çendî dewlet di warê serbestiya zimanê Kurdî de niha
mecbûr maye û tawîzeke girîng dide jî, ger Kurd bi ser
dewletê ve neçin, ger rewşênbîrên Kurd li zimanê xwe
xwedî dernekevin, ger berpîrsîyar û xwediyên sazî û we-
şanên Kurdî di dadgehan de xwe bi Kurdî neparêzin bi
rastî, dewlet tiştê ku niha di destê me de ye, ku fersendê
bibîne wê wan jî, ji me bistîne. Ma ku em li nirxên xwe
xwedî dernekevin, wan neparêzin û qewintir nekin, wê
dewleteke dagirker çima mafên me bipejirîne û bide?

Em dibêjin, ji niha û pê ve Kurdên ku bi Kurdî dizanin,
bi taybetî jî Kurdên ku di hêla ziman û weşanên Kurdî de
xebatê dikin, pêwîst e bi zimanê xwe bipeyivin û li daî-
reyên dewletê, li restorant û terminalan, li dibistan û karis-
tanan, li salonên dadgehan, bi kurtî li her cih û deveran bi
zimanê xwe bipeyivin û xwe bi zimanê xwe biparêzin. Ev
divê bibe wek prensîbeke najêger. Ger em wê yekê pêk
neynin, kes ji bo çavên me yên reş mafên me nade me, lê
dema em bi fedekariyê li pey mafê xwe bigerin hingê ser-
keftin pirr nêzîk e, ne tenê di hêla Kurdî de, di hemû hêlan
de.

Mazhar Günbat

Li Cezayîrê generalek bû serok

■ Tayînkirina wezîrê karê parêziyê wek serokkomar, tu tişt çareser nekir û ji aliyê raya demokratîk ya Cezayîrê ve ne hate pejîrandin, ji ber vê yekê konferansa ku ji aliyê rêveberiya leşkerî ve hate li dar xistin, ji aliyê hemû partiyên girseyî ve hate boykotkirin.

Nûçeyên Derve- Di konferansa ku roja 30'ê Rêbendanê, li Club de Pins (20 km'yan ji payitextê dûr e) Civiabû de, roja 31'ê Rêbendanê Wezîrê Karê Parêziyê Liamîne Zerova (52 salî) wek serokkomar hate hilbijartin. Ev bûyer bandoreke baş li şer nake, leşker dema di 1992'yan de hatin ser kar, digotin: "Emê rêveberiyê bidin sîvîlan," lê

ev tişt çênebû. General bi sondxwarina xwe, dest bi kar kir, lê navêroka vê sondê qet li rewşa Cezayîrê nedihat. Di vê sondê de wiha tê gotin: "Bi navê Yezdanê mezin ez sond dixwim ku ezê ji bo giramgir û serkeftina dîne îslam, ji bo parastina qanûna bingehîn kar bikim û li hemberî bijarteka gel a azad giramgir bibim."


General Zeroual ê ku ji aliyê Lijneya Ewlekariya Bilind wek serokkomar hate binavkirin, di axaftina xwe ya yekemîn de wiha got: "Serokkomariya min piştî hemû xebatên ku Lijneya Ewlekariya Bilind pêk anîn û negihîşt tu encamê, hat." Dîsa got ku, wî ji ber daxwaza pîrrianiya gelê ku aştî û ewlekariyê dixwaze ev pey-wir pejîrandiye. Pişt re Zeroual gotina xwe wiha domand: "Artêşa Gel a Nete-weyî piştgiriya hemû xebatên ji bo rizgarkirina Cezayîrê ji vê rewşa bi xetere û tevlihev, bi her azîneyê dike."

Wek tê zanîn ew konferansa ku pêk hat, li sernavê

pêk anîna lihevkerinê çêbû. Lê hemû partiyên girseyî ew konferans boykot kir, ji ber ku rayedarên dewletê (artêşê) rê li ber qewimînên demokratîk venake.

Piştî ku serokê berê Ali Kafi di meha Tirmehê de hate kuştin, Cezayîr ji aliyê Lijneyeke ji 5 generalan pêk hatî ve dihat birêvêbirin.

Gelê Cezayîr di nav şerê dewletê û îslamiyan de maye. Heta niha gelek mirovên sîvîl ji aliyê gerîlayên îslamî ve (bi pîrrianiya mirovên biyanî) û kontr-gerîlayan ve (dilxwaz û şervanên îslamî) hatine kuştin. Li Cezayîrê mirovên pêşverû jî di navbera îslamî û leşkeran da mane.



NASNAMEYA CEZAYÎR

Komara Demokratîk a Gelî ya Cezayîrê (navê fermî), piştî şerê serxwebûnê li dijî dagirkerên Fransîz, ku di navbera salên 1954 û 1962'yan bi pêşengiya Eniya Rizgariya Neteweyî (ERN) qewimî û bi ser ket ava bû. Cezayîr li ser bejayî (qite) ya Afrîkayê xwediyê 2. 460. 500 km² çarkoşe rûerdî ye.

Nifûsa Cezayîrê li gorî reqemên 1989'an 25 milyon e. Ev komar ji 31 wilayetan pêk hatiye û payitexta wê El-Jey (Alger) e. Nifûsa Cezayîrê ji sedî 99 Erebên berberî ne û gel ji sedî 99 mislimanên Sunnî ye.

Aborî

Çandinî û darûber bi pîrrianiya li kersaxê, li bakûrê Cezayîrê ye, hilberiyên ku digihêjin ev in: Genim, ce, nîsk, fekî û sebze ye.

Pêşesazî, amadekirina xwareka parastî (konserve), tekstîl, kinc, sazkirina hilberiyên neftê (ji sedî 30 Dahata neteweyî ji wê tê). Cezayîr jî aliyê gaza xwezayî ve dewlemed e, ji vê hêlê ve li dinê di rêza caremîn de cih digire.

Rewşa polîtîk ne baş e, di nav şerê hundirîn de dijî. Wî şerî piştî derbeya leşkerî ku di Rêbendana 1991'yan pêk hat dest pê kir. Di meha Berfanbarê ya 1992'an de hilbijartinê de hêzên îslamî, Eniya Selametê ya Îslamî (ESÎ) bi ser ket, li ser vê yekê artêşê dest danî ser rêveberiyê û ESÎ qedex kir, bi vê yekê jî şerê di navbera artêşê û hêzên Îslamî de dest pê kir. Heta niha nêzî 3000 kes vî şerî de can dane.



Artêşa Cezayîr dixwaze Cezayîrê bi temamî bixe bin kontrola xwe..



Mislimanên Cezayîr jî, xwedî hêzeke xurt in.

Dest rêj kirdin le Refsencanî

Le helmetêkî piyawani asayişî Iranî da zor be germî be diway ew kesneda degerên ke destiyên le pîlanî kuştinî Haşimî Refsencanî da hebwe. Hewldanî kuştinî Refsencanî le katêkda bû ke le serme zarî "Ayetullah Xumeynî" bo nîzîkey du hezar kes qseyde kird. Belam ta êsta be resmî ranegeyenrawe ke pîlanî kuştinî Serokî dewlet le arada bwe, ewende heye serçawe polîsiyekan amajeyan bewe kird ke weku pîlanî kuştinî helsû kewî legelda deken. Serokî Iranî diwabe dway rudawel leser şayey TV qisey bo xelik kird bo ewey le selametî xoy dilnîyayan bikat. Şayete ayanekan wtiyan Piyawani Polis le şiwênî rudaweke mirovêkiyan girtuwe ke be deman çekey çîwar yan pênic gulley teqanduwe. Derbârey rudaweke zor boçunî çiyawaz hen, hen rêkxirawî "Mucahîdî Xelik" tawanbar deken û heysin delên ke lewaneye Refsencane xoy em karey kirdibê bo ewey xoşewîstî cemawer ziyatir be lay xoyda rakêşet.

Rojnamey Al-şerq- Al- ewset

Le Tehran...

Sizadanî Enqere dexwazin

Nûçeyên Derve- Iran lem rojaneda sengerekanî xoy leser sinurî Turkye qaym û pite û dekat, le katêkda le girîngî bordumaney Turkye kem dekatewe. Bordumaney Turkye rojî şemey rabirdu be encam geşt ke bu be hoy kujranî "9" kesî Iranî û birîndarbunî "19" kesî tir, herweha bu Be hoy kawlkirdinî "100" mal.

Qisekerêk be nawî swpay Turkyewe "Doxû Sîlahçoxlû" witi: Armancî bordumaney tenya binkekanî PKK bwe û bordumaney nawçe şaxaweyekanî nêwan sinurî Iraq û Iran û Turvey girtotewe. Pispore serbaziyeke delên: bordumaney binkey wayan pêkawe ke 100 km le binkey mebestewe durin u be aşkira diyare ke

dekewine xakî Iranewe, û manay em meseleyêş waye ke eme ne rudawekî be rêkewit biwe belku nexseyekî amade biwe û be çakî raperênrawe. Le bordumanekeda 50 firoke beşdariyan kir ke corî (F-16) û (F-4) têda hebu. Turkye pêşî çend salêk hewli ewey dawê ke Iran qayl bikat ke rêgey bidat bo ewey hêzekanî PKK le xakî Iranda der bikat û herweha qayl bêt ke hêrsî zemînî û asmanî bikate seryan.

Belam Iran rêkewtinêkî resmî leser em babete ret dekatewe. Herweha du rojnamey tunidrewî Iranî hêrsêkî tunidiyan kirde ser hukumetî Haşimî Refsencanî çunke welamî ew rudawey nedawetewe, rojnamey "Selam" birway waye ke debê xo amadekirdinî çaku be hêz

bo ew meseleye hebêt û dersêk be Turkye daden û carêkî tir netwanê le aynde da şitî wa dubare bikatewe û berpîrsiyaranî em kareş siza bidrên. Ajansî deng û basî Iran raygeyanid ke wîzîrî derwey Turkye "Hikmet Çetin" ke êsta le "Swîse" ye. Peywendî be wîzîrî derwey Iran "Alî Akber Wîlayet" yewe kirdiwew ewey bo dupat kirdotewe ke Turkye hergîz mebestî niye le naw xakî Iranda karî serbazî encam bidat, herweha "Çetin" wîtwetî ke Turkye amadeye hemu zerer û ziyaneke bibjêrêt, eme û wîfî Turkye bem ziwane wefdêk denêrête Iran û le rudaweke dekolînewe û welatekey pêşwazî her encamêk dekat û zerer û ziyaneke debjêrêt.

Rojnamey Al-Şerq-Al-ewset

Li gorî rapora KMM'ê ya şaxa Sêrtê:

'Li sala 1993'yan hezar mal hatin hilweşandin'

Şubeya KMM'ê ya Sêrtê û cihwarên derdora wê, zêdetir 70 gund ji aliyê hêzên dewletê ve hatine wêrankirin. Di pêvajoya salekê de ji xeynî hilweşandin û şewitandina hezar malên van hefte gundan, di sa ji van devêrên wêrankirî 15 kesên sivîl hatine qetilkirin.

Li gorî vê raporê, ji gundê Çelik 160, ji Şemsê (Güneşli) 180, ji Guharê (Gaziler) 70 ji Mawelê (Kelekçi) 90 û ji Mehîna (Kayikli) 140 mal bi temamî ji hêla hezên dewletê ve wêrankirî û ev gund giş hatine valakirin.

Gundên Dihê ku hatine valakirin

Derawut, Terhem, Terik

(Yanılmaz), Memiran (Görendoruk), Nivilan (Çizmeli), Girdara (Ormanardı), Hesinkan (Özlüpelit), Şişlê (Dağdüzü), Aral (Tünek Pinar), Guveşil (Ekinyol), Bilsuna (Narlidere). Ev gundên li jor giş hatine valakirin û zehfên xaniyên wan hatine hilweşandin û şewitandin.

Gundên Berwarî

Ji Navçeya Berwarî ji bistan zêdetir gund hatin valakirin. Gundên ku me navên wan tesbitkirine ev in: Ekent, Kitnis, Kevzîn, Xerxur, (Doğanca), Hut (Yanıkses), Serhel (Tosuntarla) Şunex, Borik (Karakusungur), Medrese Kindeş, Hertivina, Meges (İğneli), Geliyê Osman, Heviya, (Dağyeli), Kergêr (Demirboğan), Guyîna (Çetinkaya) Xursê (Bulmuşlar) Zivinga Hacı Elî (Yağizolak), Kene Nizer, Banisnê (Damlarca) û Gelekan (Yağmur Kayan).

Li aliyê din ji Şîwanê 16, ji Muserê ji 10 gund hatine hilweşandin û niştecihên wan hatine koçberkirin.

Hatîp Dicle berendamên bajarê Stenbolê bi çapemeniyê da nasîn

'Berendamên me yên Kurdistanê di bin çav de ne'

■ Bi nêzîkbûyina hîlbijartina belediyeyan ku di 27'ê Adara 1994'an de wê çêbibê, roj bi roj partiyên siyasî berendamên xwe kifş dikin. Partiya Demokrasiyê jî piştî gelek bajar û navçeyên Tirkîye û Kurdistanê niha jî berendamên xwe yên bajarê Stenbolê kifş kirin û bi serokatiya Serokê DEP'ê Hatîp Dicle bi civînekê pêşkêşî çapemeniyê kir.

Gul Beyazid Qenco Rojava

Partiya Demokrasiyê roja 1. 2 1994'an li Hotel Ramadayê ji bo danasîna berendamên belediyeyên bajar û navçeyên Stenbolê civînek çêkir.

Di civînekê Serokê DEP'ê Hatîp Dicle diyar kir ku: "Rewşa dawî ya Tirkîyeyê belû dike ku ji aliyê aborî û siyasî ve di krîzeke mezin de ye, wisa dixuye ku wê hîlbijartin di vî qirîzê de çêbibe. Me dixwest ku gel berendamên xwe bi vîna xwe ya azad hîlbijêre,

lê wiha dixuye ku bi vî yekê dewlet ne raziye, ji ber ku li Kurdistanê berendamên ku me ji xwe re kifş kirine bi sedemên gelek komîk an binçav dikin an jî dixin hefsê. Bi vî awayî dixwazin ku li Herêmê em bêhêz bimînin, lê bi vî rêyê jî di sa emê bi serkevin.

Çima ev pest û pêkutî li pêşiyame ne? Ji ber ku partiyame demokrasiyê diparêze, ji ber ku dixwaze her kes bi zîmanê dayîka xwe, çanda û diroka xwe fêr bibe dixwaze, partiya me sûcdar dikin. Ji ber ku mafên karkeran diparêze dixwazin dengê me bi-

birin. Ji ber ku di rewşeke wiha dijwar de ku rojê 40- 50 kes tînin kuştin, partiya me aştiyê, biratiyê diparêze û zilmê li me dikin."

Dicle berendamên bajarê Stenbolê da nasîn, yên ku bûne berendam ev in: Dr. Kemal Parlak (Berendamê Serokatiya belediyeya bajêr), Doç. Sungur Savran (Navçeya Beyoğlu), Av. Tülay Geyik (Navçeya Şişli), Alî Riza Dîzdar (Navçeya Kağıthane), Emin Babakuş (Navçeya Kartal), Bahattin Günel (Navçeya Ümraniye), Yılmaz Erdoğan (Navçeya Üsküdar), Hasan Hayrî Alkan (Navçeya Kadıköy), Ertan İldan (Navçeya Tuzla), Engîn Aras (Navçeya Sultanbeyli), Orhan Kaya (Navçeya Esenyurt) û Seyit Alî Göçük (Kiraç)

Piştî danasîna berendamên rojnamevanan ji Serokê DEP'ê pirs kirin.

Li ser pirsê rojnamevanekî Dicle wiha got: "Wek tî zanîin hefteya derbasbûyî ji aliyê aborî ve krîzeke mezin çêbû, devaluasyon çêbû. Ji bo vî eyba xwe veşêrin erîş birin ser bargehê Zelê. Bi wan bûyeran xortên Tirk û Kurd tînin kuştin, şer êdî berfirehtir dibe ev yek jî gelek me dêşîne. Bûyer jî çawa di çapemeniyê de derket ne wiha ye, agahiyên ku gihîştine me 7 gerîla û 29 gundî hatine qetilkirin."

Dicle li ser pirsê rojnamevanekî got: "Wek min berê jî gotibû li Kurdistanê berendamên me di bin çav de ne. Dewletê ew karên qirêjî si-



Hatip Dicle

partine Kontrgerîla; û bi destên wan vî kerî qirêj dike.

Tenê ne endamê berendamên me di bin pest û pêkutiyên kontrgerilade ne, yên ku buroya Gündem a Enqereyê bombe kir kî ne, yên ku van deh rojên dawî rojnameya Aydinlikê taqîp kiribe dizane kontrgerîla çî ye û çî karî dike."

BERENDAMÊN DEP'A İZMİRÊ

Partiya Demokrasiyê roja 3.2.1994'an bi Serokatiya Hatîp Dicle berendamên xwe yên bajarê İzmir û navçeyên wê bi civînekî kifş kirin. Yên ku bûne berendam:

Berendamê bajarê İzmirê: Hasan Küçükoba, Konak; Av. Bayram Özcan; Çiğli; Alî Yıldırım, Gazîemîr; Saîd Turali, Bornova; Çeto Çamlıbel, Karşıyaka; Mustafa Akgül, Buca; Kemal Coşkun, Selçuk; Mehmet Salih Atakli. Navçeya bajarê Manîsa Saruhan; Mehmet Tozan, Manîsa; Refik Bircan in.



Hatip Dicle û berendamên DEP'ê yên Stenbolê bi hev re bi hêviyê mezin li hîlbijartinê 27'ê Adarê dinêrin.

Jîrînovsky tî Tirkîyeyê

Serokê partiya Liberal a Demokrat, neteweperestê Rûsî Vladîmîr JİRİNOVSKY, roja 30'ê Rêbendanê li Sloveniyayê daxuyand ku di meha Reşemiyê de li ser vexwendina rojnameyê û şirketekê ew dê were Tirkîyeyê, lê navê şirketê û rojnameyê neda. Jîrînovsky di hevpeyvîneke xwe ya bi Ajansa Ruterê re bû de got ku, Tirkîye jî bo piştigirîya Azerbeycanê li dijî Ermenîstanê wê tîkeve nav şerê li Kafkasyayê.

Jîrînovsky gotina xwe wiha domand: "Ez naxwazim Tirkîye zîrê bibîne, lê heke alikariya Azerîyan bike, wê Ermenî jî çekan bidin Kurdan û 30 milyon Kurd hene, ev tişt wê bibê sedema parçebûna Tirkîyeyê. Piştî re wiha got Jîrînovsky: "Her roj balafirên Tirkan gundên Kurdan bombe dikin, hûn Rojavayî jî vî yekê re dibêjin demokrasi, dema em dixwazin kuştina Rûsan bê sekinandin, wê demê hûn Rojavayî jî me re dibêjin Faşîst" Jîrînovsky li ser misilmaniyê jî ditînin xwe pêşkêş kirin û wiha got: "Her misilman divê heca xwe ya bi piya temam bike, li ku dibe bila bibe, divê pêya biçê Mekeyê. Lê ew wisa dikin? Na, bi balafirên ku erdezyarên Rûs çêkirine diçin" di sa got ku tatişk kirina qanûnên İslamî veşerîna sedsala 7'an e, sedsala bêpirtûk, televîzyon û elektrîk e. Di dawîya gotina xwe de jî wiha got: "Divê di koman de bijîn û ji bo pez û hêştiran bi hevdu re şer bikin." \$ \$

Kemal Bilget hate berdan

Navenda Nûçeyan- Alîkarê Serokê Giştî yê DEP'ê Kemal Bilget roja 1.2 1994'an li Dadgeha Ewlekariya Dewletê ya Stenbolê (İDED) hate berdan.

Wek tî zanîin Alîkarê Serokê DEP'ê Bilget, roja 5.11.1994'yan ji aliyê polisên "Tekoşîna bi terorê re" bi sedem a ku Endamê (TKEP) ye Partiya Ked a Komunîst a Tirkîyeyê hatibû binçavkirin. Piştî bi 8 rojan jî hatibû girtin. Kemal Bilget cara yekemîn bû ku derxistin dadgehê û piştî ku parêziya xwe kir azad bû.

Ji bo Mahkemeya Kemal Bilget, Serokê DEP'ê Hatip Dicle, Alîkarê Serokê Giştî Osman Özçelik, parlamentere Şîmexê Selim Sadak û gelek partîvan hatibûn dadgehê. Bilget di parêziya xwe de got ku: "Polis li ser ketinasikê ez girtim, tiştên derheqê



Kemal Bilget

min de, di dosyaya min de ne rast in. Beriya ku ez bi kevîm DEP'ê di nav wê rêxistinê de ma, lê piştî ku ez hatim girtin û min cezayê xwe înfaz kir, tu tekiyê min bi wan rêxistinan re ne-

ma. Niha polis dibêje ewê ku di nav wan rêxistinan de maye, niha jî wan karan re tekiidare di min e. Yanî temamê sedemê girtina min gumane. Ez dixwazim minakeke jî bidim beriya bi çend salan polisan cerdî ser mala me kir, di rava pirtûkekê de tarîfeya xwarînekî derket ji ber ku polisan jî wê fêr ne dikir gotin: "ev pûsulayê" û jina min du meh û niv bi vî sedemê girtî ma..

Vî yekê jî baş dizamim ku sedemê girtina min ne (TKEP) an jî rêxistineke din e, tenê ji ber ku ez endamê DEP'ê me ez girtim. Polisan wexta ku ez girtim eynî wiha jimîn re gotin: "Kemal Bilget zehf dengê te dertê, her roja tu di TV'yan de dertêyî tî cezayê wê bikşîni." Ez serbestberdana xwe dixwazim" Dadgehê ew tahliye kir û mehkeme taloqî 19.4.1994'an kir.

Li ser kurs û dersên zimanê Kurdî xwendevanên Kurd çi difikirin?

'Bi dersên Kurdî em dikarin vegerin ser xwezaya xwe'

■ Bi serbestbûna zimanê Kurdî û derketina weşanên bi Kurdî, bi taybetî jî rojnameya me, hêdî hêdî be jî xwendin û nivîsandin di nav Kurdan de belav dibe û hejmara xwendevanên weşanên bi Kurdî zêde dibe. Lê xwendin û nivîsandina bi serê xwe, têra gel nake. Êdî gel dixwaze bi awayekî tekuztir û zanistîr xwendin û nivîsandina zimên hîn bibe. Ji ber vê yekê, daxwaza dersên zimanê Kurdî pêşniyar dikin, heftiya berê jî me li ser vê mijarê hevpeyvînek bi hinek kesan re weşand. Em hevpeyvîna li ser vê mijarê didomînin

Daxwaza gelek kesên Kurd bi lidarxistina kursên zimanê Kurdî ye. Tu wek hunermendekî (Sazbend) Kurd tu çi qas bi Kurdî dizanî û fikra sazkirina kursên zimanê Kurdî tu çawa dibînî?

Felat Hezoyî

- Zimanê Kurdî ji dema parvekirina Kurdistanê ve qedexe bûye û ji bir bûye. Ziman riha neteweyî ye, ku zimanek bindest be yan jî ji bir bûbe, ev her wiha wateya asîmîlebûna wî gelê ye.

Dema zimanê mirov tune be mirov wek însanekî kerr û lal e, yan jî wek ku mirov here doktorêkî biyanî, çawa mirov bi zimanê doktor nizane û nikare nexweşîna xwe ji doktor re beyan bike. Her wiha doktor jî nikare ji derd û nexweşîna nexweş re dermên bibîne. Ji destpêka parçekirina Kurdistanê ve ev planên dijîmanan e, ku Kurdan bi vî rengî neçar û winda bikin. Lê divê mirov li hember vê yekê têkoşînê bide. Çend sedem hene ji bo nezaniya zimanê Kurdî û asîmîlebûna Kurdan

1. Dewletê her tim gelê Kurd nefî û îskan kiriye, di nav Tirkan de bi cih kiriye, ji bo ku bixuricin bi ser Tirkî ve û bibin Tirk.

2. Dewlet Kurdan di malên wan de asîmîle dike. Di malan de bi metodeke telekomînîkasyonî ve asîmîlasyonê pêk tîne. Kurd jî wek Tirkan li weşanên Tirkî guhdar in. Guhdariya li weşanên Tirkî wateya xuricîna zimanê Kurdî a ber bi Tirkî ve ye, peyvên weşanî bikar tînin û ew peyvên ku Kurdan ji weşanên Tirkî yan jî Tirkan wergirtine axlebi jî wan peyvên, peyvên "Latînî û Înternasyonali ne". Di vî warî de divê em zehf hay ji zimanê xwe hebin û wek Tirkan zimanê xwe her roj neguhêrin. Vebûna kursên zimanê Kurdî baş dibe, hingê xwendin û nivîsandin dê li nav gel belav bibe.

Bi ya min daxwaza kursên zimanê Kurdî wateya vegeftina bi ser eslê xwe ve ye, lê ez kursan kêr dibînim, divê dibistan ve-

bin
Îro mirov dîna xwe dide Kurdan, Kurd ne bi hezaran, bi milyonan asîmîle bûne û ez yek ji wan im.

Yek tena tenê rojnameya Welat heye. Ev jî nagihîje her deverê. Ji ber vê yekê divê kursên zimanê Kurdî vebin û weşanên Kurdî zêde bibin.

Wek tê zanîn tu ne Kurdî û zaravê Kurdî yê Dimilkî dizanî, daxwaza te ya fêrbûna Kurmancî jî heye, ji ber çî ye?

Zeynep Uğuz

- Belê, ez bixwe Tirk im û ji Çorum'ê me. Ez Dimilkî (Zazakî) jî mêrê xwe fêrbûme, mêrê min Kurdê Dimilî ye. Mijûliyên me li malê tev bi Kurdî ne, em tu car bi Tirkî mijûl nabin ku em mecbûr nemînin. Tirkî zimanê min yê zikmakî ye, lê dîsa jî Kurdî ji min re nebûye problem, ku problem bûya jixwe ez bi yekî Kurd re nedizewicim.

Ez hem Kurdan netewe dibînim, hem jî zimanê Kurdî zimanekî neteweyî dibînim. Hevalên min yên Tirk li min ecêpmayî dimînin ku ez çawa Kurdî fêrbûme. Ez jî, ji wan re xweşbîn û nazîkbûna zimana Kurdî dibêjim, û ji wan re fêrbûna zimên tewsiye dikim. A din jî ez keça xwe dişeynim NÇM'ê (Navenda Çanda Mezopotamiya) li wir hem fêrî Kurdî dibe, hem jî di koroya zarokan de ye. Vebûna kursên zimanê Kurdî ji Kurdan zehftir ez dê pê kêfxweş bibim

Hinek Kurd nivîsara zimanê Kurdî zehmet dibînin, bi te çawan e?

- Bi rastî jî, ez nivîsara zimanê Kurdî zehmet an jî zor nabînim. Jixwe min li jor da xuyan ku zimanê Kurdî zimanekî hêsan e, xweş e. Bi hînbûna zimanê Kurdî mirov zehmetiyan nakişîne, ez ne bawer im.

Kibar Yeğîn

Kar û xebata te li vir çî ye?
- Ez endamê komîsyona Jînan a DEP'a Ûmraniyeyê me.

Çend pirsên me li ser kursa zimanê Kurdî hene û ez pirsaxwe ya pêşîn dixwazin bipirsim, ku tu wek Kurdekê çiqas bi Kurdî dizanî, dixwînî, dini-

visînî?

- Ev çend sal in ku li ser Kurdan asîmîlasyon heye, ji ber vê yekê Kurdan zimanê xwe ji bir kirine û ez baş bi Kurdî nizanîm, zanibim jî Kurdiyeke wek Tirkî (nîvî Tirkî nîvî Kurdî) dizanîm.

Li ser zimên çî daxwazên te hene?

- Li dinyayê Kurdî jî zimanek e û zimanê me ye. Helbet ez dixwazim kursên zimanê Kurdî vebin

Di Kurdiya te de peyvên Dimilkî xuyan dikin, ma tu Dimilî yî?

- Belê, ez Dimilî me.

Tu zarava xwe Dimilî behîr dizanî?

- Gava din min li jor jî da xuyan ku ez Kurdiyek wek Tirkî dizanîm, Dimiliya min jî ne rind e. Ji ber vê yekê kursên zimanê Kurdî vebin zehf rind dibe ji me re. Divê em li zimanê xwe xwedî derkevin. Zimanê me parçeyek ji me ye. Gerek em tev bi yek bin û zimanê xwe ji bin pişaftina dewleta faşîst azad bikin

Bi min yekî ku zimanê xwe nizanibe ew ne tu tişt e, ji ber ku nizane çawa bifikire û çawa bike. Di navbera du zimanan de asê dimîne. Ziman e ku neteweyan kifş dike. Divê yek bi zimanê xwe bizanibe.

Erol Gölçek (Serokê komîsyona Ciwanan a DEP'a Zeytînburnu)

Hûn komîsyona Ciwanên Zeytînburnu bi taybetî li ser kursa zimanê Kurdî disekin, dikarî şirove bikî ji ber çî ye?

- Kurdên li Zeytînburnu ne, axlebi jî wan Dimilî ne û bi Dimiliyeke seqet mijûl dibin, bi Kurmancî jî nizanin. Dimiliyên li Zeytînburnu jî hêla Erzîncan û Dêrsimê ne. Em li bajarên Tirkan mezin bûne ancax bav û dayikên me li malê bi Kurdî mijûl dibin. Em dixwaza kursên zimanê Kurdî dikin. Ev daxwaza ha jî ji têkoşîna neteweya Kurdî tê ku Kurdan wisa bi ser zimên û çanda Kurdî ve dikişîne. Kurd vedigerin ser xwezaya xwe. Jixwe yekî bi zimanê xwe nizanibe, nikare bifikire û nikare serfiraz jî bibe.

Di demên dawî de weşanên Kurdî derketin ev jî tesîreke mezin e û em ji xebatkarên Welat re gelek spasdar in rojnameya Welat tînin ta ber piyên me. Ku kursên zimanê Kurdî vebin em dê behîr spasdar bibin.

Tu rojnameya Welat dixwînî?

- Nexêr, ez bi Kurdî qet nizanîm bixwînîm. Ez hê jî nû ve peyvên Kurdî fêr dibim. Ez Dimilî me, lê Dimilî jî nizanîm. Daxwaza me ew e ku rojnameya Welat yan jî saziyên Kurdî wek NÇM û Enstîtuya Kurdî kursên zimanê Kurdî vekin. Tiş-

tekî wiha çêbibe em dê behîr spasdar bibin.

Kemal Kocatürk

Birakê Kocatürk, ma tu Tirk î?

- Na, ez ne Tirk im, ez Kurd im.

Daxwaza te jî, ji kursa zimanê Kurdî re heye?

- Ez daxwazeke wisa vêga dibihîsim ku daxwazeke wiha hebe, helbet ez jî dixwazim û ez dê beşdara dersan bibim.

Tu Kurdî dizanî?

- Nexêr, ez bi Kurdî nizanîm. Dê û bavê min dizanin û li malê bi hev re mijûl dibin.

Ji ber çî tu bi Kurdî nizanî?

- Rastiya wê ku em ji hev re bibêjin ez mirovekî asîmîlebûyî me. Ez ta niha bi Kurdî mijûl nebûme. Ji aliyek ve em ji zimanê xwe aciz bûn û ji aliyên din jî maliyên me bi me re dixeydî ku em bi Kurdî mijûl dibin. Ta min DEP'ê nas nekiribû, min nizanibû Kurdî çawan e û nas jî nedikir. Naskirina min yê zimanê Kurdî li DEP'an çêbûye.

Em hêvdar in ku kursên zimanê Kurdî vebin bi vî rengî ez jî dê zimanê Kurdî fêrbibim.

Cemal Coşkun (Serokê DEP'a Zeytînburnu)


Tu wek Serokê DEP'a Zeytînburnu, daxwazeke çawa ji kursên zimanê Kurdî dikî?

- 70 sal e ku zimanê Kurdî tê qedexekirin rê li ber pêşveçûyîna zimên hatiye girtin. Yekî ku 70 sal zimanê xwe di warê civakî pêşve nabe û tu wateya pêşveçûnê jê re tune. Ji ber ku yekî ku zimanê wî ji wî hatibe standin, mejiyê wî jî jê hatiye standin. Ez wek Kurdekî Dêrsimî kursên zimanê Kurdî zehf baş dibînin ji vî gelê bêziman re. Ji ber ku asîmîlasyon girantirîn li ser bergeha me ye. Yekî ku gihîştîye fêrbûna nasnameya xwe, divê zimanê xwe yê zikmakî jî fêrbibe.


Ercan Engîneşî:

(Demokratekî Tirke dema hevpeyvîne li wir bû) Ez wek Tirkekî, bi temamî û bi dil û can bi serok re me. Divê her gel zimanê xwe yê zikmakî bizanibe.

Hevpeyvîn: S.S. Dilpolo



Cemal Coşkun



Felat Hezoyî




Zeynep Uğuz



Kibar Yeğîn



Erol Gölçek



Kemal Kocatürk

Neat



Heta ku şêr bibin xwediyê dirokzanên xwe, wê bi çirokên nêçirvaniyê her tim pesna nêçirvan bidin.

Gotina Pêşiyên ya Afrîkayê

Serpêhatiyek bi devokê Dêrikê

'Qipirdema heval'

Li Qosera (Kiziltepe) Mêrdinê xortek heye gi bi xisûsiyetên xwe cihkî muhîm digre. Ji ber hin sebebên psîkolojîk Heval Qomançero, li Qoserê bi hawakî "dîn" tê naskirin. Navê wî ê esil helbet ne ev e lê ji me re navê wî ê esil nelazim e. Navê Qomançero ji ber strana, gi berî niha bi çend salan li dinyê û li Kurdistanê jî pirr meşûr bûbû, tê. Îcar ev hevala jî her tim û daîm ev stran li her derê, li ser daxwazên jêhezkirê wî, digot û navê stranê bû navê wî. Em werin ser mesela xwe, bi gotinek din em çima qala wî dikin. Bi tenê emê di vê nivîsê de qala meseleyak wî bikin. Qomançero, gava stran digot ji dêvla mîkrofonê darek ji xwe re hazir kiribû û bi wî darî hereketên wek ê senetkarên Ewropîyan dikir. Lê ev dar rojekê li serê Qomançero bû bela. Gava memûrekî dewletê tê Kurdistanê, hêj ecemî ye û kor e. Yek ji van jî polisekî ecemî bû. Rebeno hingî li derveyî



Kurdistanê qala wê, bi hawakî nexweş û bi hoviî tê kirin û ew jî ji Tirkîyê nû hatibû, bi wan tirsên xwe û ji nişka ve bi darê Qomançero veciniqî. "Qipirdema heval, eller yukarî yürü! (Tevneger heval, dest li heva û bimeşe!)" Qomançero, wek her car, bi dengê nerm ji wî rebenî (!) re ev peyv gotibû. Bi gotina Qomançero re polis di nav

sûkê de hêdihêdî dimeşe, çend metre dimeşinnameşin xelkê gi wan dibinin bi wan dikenin lê polis lê hay nakeve heta gi hevalekî wî ê polis wî ji vî hafi xelas dike. Lê Qomançero, ji lêxistin û îşkenceya polîsan xwe xelas nekir. Wî ji halekî xistin halekî din. Ma hewqas rehet e gi mere ji polisekî re bêje "Qipirdema heval".

KÊ ÇI PEKAND?

Ez zavayê Sêwasiya me, bila giş rayên xwe bidin min.

Bedrettîn Dalan
Berendamekî Belediyeya Stenbolê

'Eger min hebit filuz, ezê çî jêkim namûs?'

Cehşikên li navçeya ew yên nas dema me carina li qehwexaneyan diditin, digotin: "Hûn ji bo çî ji me hez nakin, bi dîn û îman em ji we Kurdtir in." Hevalekî gote wan: "Kuro behsa dîn û îman neke." Hevalekî din gote wî: "Heval bira ma çî tiştê me maye bi hev re, da ku dîn û îman bimîne ew qala dîn û îmana xwe dikin." Ewê cehşik got: "Bira... me gote wî: "haşa, haşa." Ê got: "Ez bibêjim çî?" Me jî got: "Tu mafê we nîn e hûn li ser xaka welêt bigerin, çimkî welat bi xwînê hatiye avdan. Dema hûn li ser digerin hûn diherimînin û kincên Kurdan li xwe nekin, yên tîman li xwe bikin."

Wî cehşikî got: "Ê ne min got we em jî Kurd in, zimanê me yek e, bavê me birayê hevdû ne. Tu xerabî ji me çênabin, lê wele hinek benameş hene wekî hûn dibêjin, "Eger min hebit filuz, ezê çî jêkim namûs."

Min jî got: "Ka raweste ezê tiştêkî bibêjim? Bi mêranî hûn bêminet in, çî xerabî ji destê we tê bikin, jixwe hûn dikin jî, lê wele eger hûn rojekê bibêjin emê qenciyeke bikin, hûn kincên me li xwe nakin. Çawa ku leşkerên Tirkî me bi zêran bixşînin em di sa kincên wan li xwe nakin, divê (gerek) hûn jî kincên terorîstan li xwe nekin."

Wî cehşikî got: "Lawo tu bi Xwedayê xwe kî, sedema van kincan ji me re bibêje. Ma gelek girîng e?"

Min jî got: "Sedem girîng bibe nebe ezê bi mîsalek bînim zimên û biryara dawî ya te ye..."

Di dema Silêman Pêxember de (A.S) leglegêk di mêrgekî de diçerî û wextek leglega belengaz serê xwe rakir û bala xwe dayê ku sofîyekî serî spî li hinda wî tê. Leglegê karê xwe kir ku bireve, lê bala xwe baş da zilêm ku kincên wî ne yên şilatiyan bû (serserî) û sekinî ji xwe re got: "Wele xerabî ji vî camêrî çênabit."

Sofîyê serî spî kopalê xwe paş xwe ve veşartibû û hat rasta leglegê, kopalê xwe ji paş xwe ve deranî û got 'şerq' li lingê leglegê da û herdu piyên leglegê şikandin. Got: "Hewar vî ez kuştim!" Silêman Pêxember (A.S) bi ragihandina bayê, pê hesiya û ferman da bayê, got: "Bila herdu bêne vir."

Ba jî bi fermana Xwedê, misexerê Silêman Pêxember kiribû legleg û sofî anîn cem pêxember. Pêxember got: "Sofî tu dizanî bi şera Xwedê (c.c) divê (gerek) ez jî lingê te bişkinim." Leglegî jê re got: "Ya Resûlullah pêwîst nabe ku, tu piyên wî bişkinî, ez wî efû dikim, lê bi şertekî; tu ji kerema xwe re ew kumê (kulah) spî jî serê wî bike bes e." Wî cehşikî got: "Wele hûn mafdar in û Xwedê mala zaliman di ser de bîne." Me jî got sed caran.

Rêber Işık / Ronî

Jüji

Doğan Güzel



Di doza girtina Welat de

Dewletê Kurdî nas kir!

Navenda Nûçeyan- Mehkema doza Welat ji ber tunebûna wergêrê Kurdî hate taloqkirin. Di danîşîna 31.1.1994'an de ji ber ku Berpirsiyarê Nivîsaran Mazhar Günbat bi Kurdî parêziya xwe kir. Lijneya Dadgehê kete tengasiyê û doza darizandina Welat avêtin 5'ê Avrêlê (Nîsan).

Darizandina rojnameya me di 31'ê mehê de li Dadgeha Ewlekariya Dewletê ya Stenbolê (DED-S) hate kirin. Lê hîn

di serê danîşînê de, dema ku nav hate tesbîtkirin ji ber nebûna wergêr asteng û gelş derketin. Û rê li ber daraziyê hate girtin.

Günbat daxwaza parêziya bi Kurdî di danîşînê de wiha anî ziman: "Ez bi Tirkî dizanim. Lê ez berpirsiyarê rojnameyê ke bi Kurdî me. Axaftina bi Kurdî mafê xwezayî yê gelê Kurd e. Lewre ez dixwazim bi Kurdî xwe biparêzim."

Divê navê de ebûqatên Gün-

bat têkilî bi qonaxê kirin û daxuyandin ku muwekilê wan bêhtir dikare bi zimanê xwe yî zikmakî parêziya xwe bide û daxwaza xwe ya ku pêdivî bi wergêrekî ku bi Kurdî dizane heye, anîn zimên.

Li ser vê yekê Serokê Dadgehê Lütfü İşbulan bi Tirkî, "Min jî li Bilisê dozgerî kiriye. Ez jî ji "Ez bi Tirkî nizanim" fêm dikim." Ji aliyê din ve diyar kir ku Berpirsiyarê Nivîsaran ê Welat Mazhar Günbat di

dema pirsiyariya ji bo amadehiya dadgehê de li gel Dozgerê Komarê de bi Tirkî axiviye û pişt re danîşîn avête 5'ê Avrêlê, saet 10'an.

Wek tê zanîn Dozgerê DED'a Stenbolê Mehmet Demirci ji ber du nivîsên di hejmarê 73'yan ên di Welat de dozê li rojnameya me vekiribû. Doz bi hinceta ku bi riya çapemeniyê propagandeya parvekarîyê li dijî Tirkiyeyê hatiye kirin hebûye û li gorî Qanûnê Antî

Terorê 3713, xala 8/ 1-2'yan ji Mazhar Günbat re ji 2 salan heta bi 5 salan cezayê hepsê û 100 milyon jî cezayê pereyî, li gorî 2/1 a ku, li Qanûnê Çapemeniyê ya bi hejmara 5680'yan ve hatiye zêdekirin jî, ji 3 rojan ta bi mehekê radana ronameya Welat tê xwestin. Herdu nivîsên ku ji daraziyê re bûne mijar nivîsa manşetê "Gelê Tirk jî bi ser xwe ve tê" û nûçeya bi navê "Li Edenê polîsan teror pêk anî" ye.

Di danîşîna doza girtina Welat de ger wergêr amade bûya wê Mazhar Günbat ev xweparêzname bixwenda. Bes ji ber nebûna wergêr nehate xwendin. Em wê pêşkêşî xwendevanên xwe dikin

Berî ku dest bi parastina xwe bikim, dixwazim ji bo ronahîkirina vê daraziyê û girîngiya vê dozê wek pêşgotin li ser sê xalan rawestim. Bi nêrîna min, ji xwe ta ku ev peşdaxuyanî neyê kirin, ne gengaz e darazîna girtina Welat dest pê bike.

1- Îro, dozgerê DED'a Stenbolê bêhemdê xwe be jî, bûye sedem ku fersendeke dîrokî bikeve destê me û wek derjê (encam) bûye sedemê bi awayekî fermî pejrîna zimanê Kurdî. Ji ber vê yekê ez spasiya xwe pêşkêşî wî dikim.

2- Tevî ku rewşeke erênî ji bo me û ji bo nasîna zimanê Kurdî derketiye holê, ez vî awayî darazîne nerast, ne dawer dibînim û li dijî ev cure helwesta dozger û dadgerê DED'a Stenbolê me.

3- Nivîsên ku derbarê wan de doz hatiye vekirin, bi awayekî çewt hatine wergerandin. Ta ku naveroka van nûçeyan bi destê wergêrekî pisporê zimanê Kurdî neyê wergerandin û rastwergera wê ji hêla saziyê Kurdî ve neyê pejrîrandin, ne gengaz e ji ber naveroka van nivîsên ku ezê sernavê wan li jêr binim zimên, der barê rojnameya Welat de doza girtinê bê vekirin û ne rast e ku ez jî, ji ber vê yekê bêm tawanbarkirin.

Piştî diyarkirina van her sê xalan, dîsa pêwîst e bi çend peyv û hevokên din naveroka wan hinekî din bê vekirin û zelalkirin.

Wek xala yekemîn, di destpêka axaftina xwe de min spasiya xwe pêşkêşî girambar dozger Mehmet Demirci kir ji ber ku bi vekirina vê dozê rewşeke dîrokî derjêya holê. Helbet ev rewşa dîrokî derjêya têkoşîna pêvajoyêke pîrê dirêj e. Bes dozgerê birêz bêvîn û bêhemdê xwe be jî, bûye pêkerekî derjêyî (encam) ku zimanê Kurdî bi awayekî fermî bê pejrîrandin. Zimanekî ku ji destpêka damezirandina Komara Tirk ve hemû rê lê hatine girtin, qedexekirin û yê pê peyivîne an jî nivîsîne, bi tawanê mezin hatine sizakirin, esta bi vê darizînê fermîbûna wê dikeve rojevê. Li aliyê din, derfeteke welê girîng û dîrokî ketiye destê me ku ev jî parastina bi zimanê Kurdî ye. Em giş baş dizanin û bûyerên ku di demajoya heftê salên dawî de ji nişan

■ Ji awayê darizandin û dozvekirinê DED'ê ez têdigihîjim ku ev helwesta DED'ê ya li hember rojnameya me helwesteke konevanî ye. Ger ev helwest ne konevanî bûya wê berî hejmarê 73. û piştî 73. ji wê der barê nivîsên Welat de doz bihata vekirin, ji ber ku zehfên nivîsên me ku dewlet bi vê mentiqê nêzikî bûyeran bibe, dikarin bêm tawanbarkirin. Bes DED vê yekê nake ji ber ku, bi helwesteke ramyarî doz der barê me de hatiye vekirin.

didin ku ji ber axaftina vî zimanî, gelê Kurd tiştên nebûyî û nebîhîstî derbas kirine. Demekê, ne tenê nivîsandin û xwendina Kurdî, lê axaftina wî jî hatibû rader (qedexe) kirin. Kesî di mala xwe de jî nediwêribû pê bipeyîve. Li dibistanên seretayî, "serokatîya şaxê zimên" hebû. Kesê ku ev peyvir digirte ser xwe, navê xwendekarên ku bi Kurdî qise dikirin, dinivîsand û dida mamoste da ku bêm sizakirin. Ez bawer nakim ku li ser rûyê dinê ev awayê raderkirina zimanê neteweyekî li welatekî din hatibe pêkanîn. Der barê zincîrkirina zimanê gelê Kurd de mînakên ku mirov diheyîrînin û sosretmayî dihêlin hene û qewimîne. Bes pêwîst nake em yekê yekê tevan li vir binim zimên, ji xwe wext jî têrî ve yekê nake. Bi kurtî ku mirov bibêje, ev doz ji ber ku derfeta xwe parastina bi Kurdî ji me re derxistiye holê, wek derjê ez bûyereke erênî û dîrokî dinirxînim û spasdariya xwe pêşkêşî DED'ê dikim.

Dîsa di wateya pêşxuyaniyê de min dil heye, ku xala duyemîn jî bi van gotinên li jêr ji hev vezelînim bi mebesta têgihandîneke qewîntir. Tevî ku DED'ê wek encam derfeteke welê dîrokî ji me re pêşkêş kiriye û ji ber vê qenciya wî ya bêhemd ez jê re spasdarbûna xwe tînim zimên, pêwîst û girîng dibînim bibêjim ku ji aliyê nîrxandin û nêrîna xwe ve, ji hêla nêzikbûna li bûyer û qewimînan ve ez yekcar ji serwestiya dozger û dadgerê DED'ê vediqetim û ne bi wan re me. Ji ber vê yekê û gelek yekên din, bi rêdana rayedar û berpirsiyarên xwedî hest û ramanên mirovî yê hevgerî û serwest, bi xwespartîna maf û prensîbên mirovî yê danezana gerdûnî, peymanî Helsinki û

Çarta Parisê ez dixwazim berî parêziya naveroka nivîsên Welat, çend pirsên girîng ên peywendarên ve rewşê ji rayedar û berpirsiyarên Dadgeha Ewlekariya Dewletê ya Stenbolê bikim. Lewre ji xwe ta ku bersiva van pirsên ezê li jêr pêşkêşî DED'ê bikim, neyê dayîn û hin xalên şêlo neyên zelalkirin ne gengaz û ne berbiçav e ku doza girtinê der barê rojnameya welat de bê pêkanîn û berpirsiyarê wê yê nivîsaran bê tawanbarkirin. Ger ev yek neyê pejrîrandin, darizandina bi vî awayî nikare mîna mafdar û dawer bê li darxistin. Vêca ez naxwazim vê xalê dirêjtir bikim û esta dixwazim van pirsên jêrîn binim zimên. Yek; herdu nivîsên Welat yê hejmarê 73. "Gelê Tirk jî bi ser xwe ve tê" û "Polîsan li Edenê teror pêk anîn" ku der barê wan de doz hatiye vekirin û ji ber naveroka wan, dozgerê birêz Mehmet Demirci daxwaza girtina Welat û cezakirina min dike, wekî ku bi Kurdî ne, ji aliyê kê ve hatine wergerandin. Di îdianameya dozgerê birêz Mehmet Demirci de qala wergêrekî sondxwarî tê kirin. Ev wergêr kî ye, çendî pisporê zimanê Kurdî ye û pisporiya wî ji aliyê kê an jî kîjan sazgeha Kurdî ve hatiye pejrîrandin, ger pisporiya wî nehatiye teyîdkirin, dikare bi çî awayî bi me bide bawerkirin ku xwedî raye ye di warê zanîna zimanê Kurdî de.

Hûn jî baş dizanin ku ji bo wergêriya sondxwarî hin pîvan û rêzik hene. Dema ev pîvan û rêzîkên pêwîst li ber çav neyên girtin û neyên pêkanîn, bi helwesteke keyfî tayînkirina kesekî ji rêzê wek wergêrê sondxwarî, gelo çiqas qanûnî û li cih e? Zimanekî ku li zanîngehên Komara Dewleta Tirk, bi-

karanîn û pê werderkirin li aliyekî hebûna wê jî neyê pejrîrandin, wergêrê wê yê sondxwarî ji asîmana tê şandin an jî bi şêweyekî din ê ku em nizanin, tê afirandin?

Ev herdu nivîs (hûn jî baş dizanin) berî ku bêm wergerandin der barê wan de, der barê naveroka wan de pirsiyarî hatibû destpêkirin ji hêla dozgerê DED'ê Mehmet Demirci ve. Nivîsên ku nehati bin wergerandin li gorî kîjan serwestî û mentiqî dibin mijara doza dadgehekê?

Ji bo xala dawî jî pêdivî bi çend hevokên din ên zelalkirinê heye. Herdu nivîs jî bi giştî çewt hatine wergerandin. Ez dikarim bibêjim ku wergêrekî sondxwarî yê zimanê İngilîzî, Almanî an jî zimanekî din, ku bi vî awayî nivîsekê bi wan zimanan wergerînin, di tu ofîsên wergêriyê de nikarin binim û wê ji kar bêne avêtin. Hevokên nivîsên Welat kê hatine wergerandin, wergêr wateya peyvên Kurdî li gorî dilê xwe guhertiye û bi awayekî dijzanistî ev kar xwedênegiravî pêk anîne. Ger bersiva herdu pirsên min ên pêşîn bê dayîn, hingê ez dikarim bidim zanîn û îspat bikim ku wergera wergêrê "sondxwarî" bi giştî çewt û dilî ye. Ji ber vê yekê pêwîst e herdu nivîs jî, ji nû ve bi destê pisporêkî zimanê Kurdî bê wergerandin û rastiya wê jî qet nebe ji hêla Enstîtuyê Kurdî ve bê teyîdkirin.

Berî ku em derbasî bendewariya bersivên we yê pêwîst bibin, min dil heye wek gotinên dawî yê pêşgotina xwe, vê yekê li jêr binim ziman.

Ji awayê darizandin û dozvekirina DED'ê ez têdigihîjim ku ev helwesta DED'ê ya li hember rojnameya me helwesteke konevanî ye. Ger ev helwest ne konevanî bûya wê berî hejmarê 73. û piştî 73. ji wê der barê nivîsên Welat de doz bihata vekirin, ji ber ku zehfên nivîsên me ku dewlet bi vê mentiqê nêzikî bûyeran bibe, dikarin bêm tawanbarkirin. Bes DED vê yekê nake ji ber ku, bi helwesteke ramyarî doz der barê me de hatiye vekirin û derfeta DED'ê jî nîn e hemû nivîsên Welat bide xwendin û wergerandin.

Ji bo niha gotinên min ev bûn. Spas dikim.

Rastnivîsa lêkerên hevedudanî

■ Lêkerên hevedudanî ew tewre (cins) lêker in ku ji çend hêmanan (ûnsûran) pêk tên. Ji van hêmanan yek lêkerî (verbal) ye û ya/yên din nelêkerî (non-verbal) ye/ne. Hêmaneke nelêkerî dikare nav, rengdêr, daçek, pêspirtik an jî rengpîşeyek be, wek: Bi rê ketin, rabûn, hwd. "bi rê ketin" ji sê hêmanan pêk tê: Bi, rê ketin. Ji van yek (ketin) lêkerî ye, bes yên din [bi (dacek), rê (nav)] ne lêkerî ne. Her wiha lêkera "rabûn" ji du hêmanan pêk tê: Ra- (pêspirtik), bûn (lêker).

Baran Rizgar

Wek ku tê zanîn, qaîdeyên rastnivîsê ne serbixwe ne; ew bi rêzimanê ve girêdayî ne. Ango gava ku mirov li ser rastnivîsê tiştekî difikire û dixwaze bi qaîdeyekê ve girê bide, mirov nikare guh nede rêzîmên. Divê mirov berê bi alîkariya rêzîmên fonksiyon, têkildarî, hwd. yên wî tişî rave bike û dûre biryara qaîdeya nivîsîna wî bide. Bi gotîneke din, qaîdeyên rastnivîsê bi giştî bi ravekirinên rêzîmanî ve girêdayî ne û bîyî vê peyvgirêdan û têkildariyê, mirov nikare ji qaîdeyêke rastnivîsê re bibêje rast e an çewte.

Ji ber vê yekê, her çiqas babetê vê nivîsê rastnivîsa lêkerên hevedudanî be jî, divê lêkerên hevedudanî berê bi rêzîmanî werin ravekirin û paşê li ser qaîdeyên rastnivîsa wan were rastwestin. Wê gavê divê mirov pêşin pîrsekê bike: Lêkerên hevedudanî çi ne?

Lêkerên hevedudanî ew tewre (cins) lêker in ku ji çend hêmanan (ûnsûran) pêk tên. Ji van hêmanan yek lêkerî (verbal) ye û ya/yên din nelêkerî (non-verbal) ye/ne. Hêmaneke nelêkerî dikare nav, rengdêr, daçek, pêspirtik an jî rengpîşeyek be, wek: Bi rê ketin, rabûn, hwd. "bi rê ketin" ji sê hêmanan pêk tê: Bi, rê ketin. Ji van yek (ketin) lêkerî ye, bes yên din [bi (dacek), rê (nav)] ne lêkerî ne. Her wiha lêkera "rabûn" ji du hêmanan pêk tê: Ra- (pêspirtik), bûn (lêker).

Bêguman xweserîya lêkerên hevedudanî ne tenê pîrhêmanbûna wan e. Ew her wiha xwediyê wateyêke (maneyêke) taybetî ne û pîr caran wateya lêkerêke hevedudanî, ji ya lêkera bîngêhîr pîr cuda ye. Hek ne wiha be, ew nabe lêkerêke hevedudanî Ango her lêker û daçekek bi hev re lêkerêke hevedudanî çênakin; ji bo ku lêkerêke hevedudanî çêkin, divê lêkerêke bi wateyêke cuda were afirandin. Di hin nivîsan de, pê re çûn, jê re gotin, hwd. lêkerên hevedudanî tîr xuyakirin. Ew ne lêkerên hevedudanî ne, ji ber ku ew tewre tîrkildarî ne ji bo çêkirina lêkerêke din e.

Lê belê, lêkerên wek lê dan, lê kirin, hwd. hevedudanî ne. Ew ji wateya eslî ya lêkerê dîr dikevin û yeka nû diafirînin. Wek mînak: Lê nêrîn. Ev ne lêkerêke hevedudanî ye. Lewra "lê" wateyêke cuda çênake (lêker dîsa nêrîn e), ew tenê nîşan dike ku ev lêker (nêrîn) bi wasita daçeka "lê" digihîje berkirde yê (serve, obje). Ango mirov dibêje, Ez li wî dinêrim. wek ku xuya ye, tu wateyên nuh dernakevin. Lê belê, lê xistin lêkerêke hevedudanî ye. Ji ber ku wateyêke nuh diafirîne (Min li derî xist. Min li gîtarê xist, hwd.). Ev xal girîng e; ji ber ku di hin nivîsan de, ew tewre daçek + lêker jî, ji lêkerên hevedudanî tîr hesabandin.

Pirtewrebûna hêmanên nelêkerî bi xwe re pirtewrebûna lêkerên hevedudanî jî tîr. Ango ji ber ku hêmanên nelêkerî tewre tewre ne, lêkerên hevedudanî jî dibin tewre tewre. Dîsa ji ber ku lêkerên hevedudanî pirtewre ne, rastnivîsa wan jî divê li gor tewreyê wan bibe. Bi gotîneke din, em nikarin tenê qaîdeyekê biafirînin û bibêjin, divê lêkerên hevedudanî li gor vê qaîdeyê bîr nivîsîn. Lewra divê em berê lêkerên hevedudanî li gor tewrên wan ji hev derînin (tesnîf bikin), da ku em bikaribin bi zelalî li ser qaîdeyên rastnivîsa wan kûr bibin.

1. HÊMANA NELÊKERÎ PÊSPIRTIKEKE E

Di vê tewra lêkerên hevedudanî de, hêmana nelêkerî bi ya lêkerî re wek pêspirtikekê kelîyaye û ne xwediyê tu fonksiyonên serbixwe ye. Ji lewra, gava ku ew tewre lêker di raweya fermanî, bilanî û demên ku li ser bilanî ava dibin de tîr kişandin, hêmana nelêkerî jî dêvla (dewsa) pêspirtika "bi-" jî kar dike û "bi-" nayê bikaranîn. Rabûn: Rabe, ez rabim, ez ê rabim, hwd. Li gora qaîdeyên van deman, heke hêmana nelêkerî bi ya lêkerî re nekeliyabûya û xwediyê fonksiyoneke serbixwe bûya, diviya me bigota: Ra (bi) be, ez ra (bi) bim, ez ê ra (bi) bim, hwd. Wek ku em dibêjin: Bixwe, ez bidirûm,

ez ê birevînim, hwd.

1.A HÊMANA NELÊKERÎ PÊSPIRTIKE KE SADE YE

Hêmanane lêkerî pêspirtikeke sade ye û bi tena xwe ne tu wate û ne jî tu fonksiyona wê heye. Ev tewre pêspirtik û lêkerên hevedudanî yên ku bi wan hatine çêkirin li jêr in: Ba: Badan

Da: Daçikandin, dadan, dagerandin, dagerîn, dagirtin, dahatin, daketin, daniştin, danîn, daqurtandin, daxistin

Hil: Hilanîn, hilatin, hilavêtin, hilawistin, hilbijartin, hilçinîn, hilçûn, hildan, hilgirtin, hilketin, hilkirin, hilkiştin, hilweşandin

Ra: Rabûn, radan, ragihandin, ragirtin, rahiştin, raketin, rakirin, ramûsan (ramîsan), raxistin

Ve: Vebûn, vebirîn, veçinandin, veciniqîn, veçinîn, vedan, veşandin, veşerîn, vedizîn, vejîn, vekirin, vekişandin, vexwarin, Ver: verşandin, verşin

Di hin nivîsan de lêkera "weşandin" wek lêkerêke hevedudanî û her wiha "we-" jî wek pêspirtikekê tê ravekirin. Ev ravekirin ne rast e. "Weşandin" lêkerêke sade ye û "we-" jî ne pêspirtika "şandin" yê. Lewra ev lêker ne ji "şandinê" lê ji "weş" hatiye çêkirin. Ji eynî jêderkê "weşin/weşiyar" jî hatiye çêkirin. Ji xwe ji kişandinên wan di raweya fermanî û bilanî de jî ev xuya dibe: Biweşîne, biweşe, ez biweşînim, pelên darê dê biweşin, hwd.

Vê: Vêketin, vexistin wer: Werbûn, wergerandin, wergerrîn, wergirtin

Di hin nivîsan de lêkera "weşandin" wek lêkerêke hevedudanî û her wiha "we-" jî wek pêspirtikekê tê ravekirin. Ev ravekirin ne rast e. "Weşandin" lêkerêke sade ye û "we-" jî ne pêspirtika "şandin" e. Lewra ev lêker ne ji "şandin" lê ji "weş" hatiye çêkirin. Ji eynî jêderkê "weşin/weşiyar" jî hatiye çêkirin. Ji xwe ji kişandinên wan di raweya fermanî û bilanî de jî ev xuya dibe: Biweşîne, biweşe, ez biweşînim, pelên darê dê biweşin, hwd.

Di rastnivîsa van lêkeran de xaleke girîng ew e ku mirov pêspirtikan bi lêkerê ve binivîse û wan cihê neke. Lewra bi tena xwe ne tu wateya wan û ne jî tu fonksiyona wan heye. Niqeteyêke din jî, di raweya fermanî û bilanî, hwd. de pêspirtika "bi" nasitînin: Vebûn (vebe, ew ê vebe), vêketin (vêkeve, ew ê vêkeve, hwd.). Çend hevokên bi van lêkeran li jêr in:

Ma ez ê her tim sobeyê dadim? Carinan jî tu dade!

Ji kerema xwe, ya min pir

danegire.

Silavan li bavê xwe bike, ez destê wî radimûsim.

Te xêr e, law ez vecinixqim! Ma wî ew nivîs wergerand Îngilîzî?

1.B PÊSPIRTIK JI NAV, RENG DÊR AN RENG PÎŞE-YEKE BÊFONKSİYON PÊK TÊ

Di vê tewra lêkeran de, hêmana nelêkerî jî nav, rengdêr an rengpîşeyekê pêk tê. Lê belê, her çiqas ew bi tenê xwedîwate bin jî, wan fonksiyona xwe ya nav, rengdêr an rengpîşebûnê windakirîye, bi hêmana nelêkerî ve kelîyane û êdî fonksiyona pêspirtikekê dibînin. Lêkerên bi vî awayî li jêr in:

berdan çêbûn, çêkirin deranîn, derbûn, derçûn, derhatin, derketin, derkirin, derpistin rêkirin (şandin) rûkirin, rûniştin

Wek ku xuya dibe, pêspirtikên van lêkeran bi tena xwe xwedî wate û fonksiyon in: rê,

KURTEYA DAÇEK Û CÎNAVEKÊ YE

Ev tewre lêker jî li gor cînavê ku bi daçekê ve dikele û pê re dibe kurteyek du beş in:

2.A.a jê, lê, pê tê: Ev her çar hêman ji daçekê û cînavêke kesîn pêk tên. Ango kurte n û daçek û cînavêke dihundirînin.

Jê: Li wî/wê (ji yekî/tiştêkî) lê: Li wî/wê (li yekî/tiştêkî) pê: Bi wî/wê (bi yekî/tiştêkî) tê: Di wî/wê (di yekî/tiştêkî)

Lêkerên herî belav ên ku wan dihundirînin li jêr in:

Jê: Jê birin, jê çûn, jê girtin, jê hatin, jê kirin, jê xistin,

lê: Lê bûn, lê çûn, lê dan, lê gerîn, lê hatin, lê ketin, lê kirin, lê kolîn, lê xistin

pê: Pê hesîn, pê kanîn, pê ketin, pê xistin

tê: Têgihîştin, têkirin, têkoşîn, têxistin

Li jor me got ku ew kurteya daçek û cînavêke ne. Ji lewra li gor fonksiyona wan a di hevokê de, gava ku hewce bibe, ji hev diqetin û her yek (daçek û cînav) fonksiyoneke cihê dibînin. Hengê her yek bi awayê xwe yê eslî jî tê nivîsîn û belavkirin. Ji aliyekî din ve jî, ew dewsa pêspirtika "bi," nagirin. Ji ber vê yekê divê ew cihê werîn nivîsîn:

Azad duh di qûmarê de pîr xesirîye, 1000 jê çûye.

Duh qûmarê de 1000 ji Azad çûye.

Gelo îcar kê jê bîriye. Dibe ku Êso ji wî biribe.

Di hevoka pêşin de, jê, teva ku tenê ji du tîpan pêk hatiye, gelek agahdariyan dihundirîne û gelek fonksiyonên wê hene:

- Lêkerêke hevedudanî çêdike (lêker ji wateya xwe ya eslî dîr ketiye, anga êdî ne wateya herî, lê belê wateya wî da kirin heye).

- Daçekê (ji) dihundirîne

- Cînavêke (wî) dihundirîne

- Heke di hevokê de ne cînav, lê nav bê bikaranîn, ew ji hev vedibe, fonksiyona xwe ya cînavkî wînda dike û dibe daçek û navekî serbixwe (di hevoka dudande bûye "ji Azad")

Wek ku xuya dibe ew tewre hêmanên nelêkerî, a) serbixwe dişuxilin (fonksiyon dikin), b) di kişandina lêkerê de tu fonksiyonan nabînin (dewsa pêspirtika "bi-" nagirin), c) li gora fonksiyonên wan ên di hevokê de teşe (şikil) diguherînin (parve dibin, dibin yek, kurt dibin, hwd.). Îcar ji ber van sedeman, divê ew cihê bîr nivîsîn. Lewra, mirov wan bi hêmana nelêkerî re binivîse û dîre jê biqetîne û parve bike, biguherîne, hwd., hem ne mantiqî ye û hem jî di warê pedagojîkî de dijiwariyan derdixe.

wê dom bike

2. HÊMANA NELÊKERÎ NAV, RENG DÊR AN RENG PÎŞE-YEKE BI WATE YE Û FONKSİYONEKE WÊ HEYE

Di van lêkeran de hêmana nelêkerî bi tena xwe jî û wek hêmaneke lêkerê jî hem watedar û hem jî fonksiyonel e. Ango hem wateya wê û hem jî fonksiyona wê heye. Ji ber ku hêmana nelêkerî fonksiyona xwe wînda nake, divê ew cihê bîr nivîsîn. Lêkerên hevedudanî yên di vê komê de, li gor tewrê hêmana nelêkerî wiha tîr beşkirin.

2.A HÊMANA NELÊKERÎ

Bo tembûrekanî Mezrabetan

Le spêdeyekî geş û pir le ûrşe wrşî
beharî mējûmanda

Diway xewnêkî qûlî jêr destan..
Diway gerû tasanêkî dirêjxayen..

Le parçeyekî em Kûrdistanê
xemgînedan..

Tembûrekanî Mezrabetan:
(Mezrabetanî) welatî şarstaniyet
û mirovayetî,

Çawy wenewziyan kwêr krdû
le xew rabûn

Rabûnêk ke iydi be hîç hoviyeke tirsnaq
Gerûwy awazî netasênret.

Hemin rabûnew pencekantan paktir
le rohî çoleke

Be ser jêy liq asay tembûrekantanewe,
Semay jiyân û berxûdan û

serfirazî deken
Ziyatrû ziyatr dexwazîn.

Dexwazîn: gerûtan gewre minarey
rast bêjîw netirsî gûtin bêt

Dexwazîn: hevokekantan kotrî aşî bin
û le asmanî

Kûrdistan û mrovayetîda le şeqey
bal biden û sitran

Bo şehîdan û pêşmerge biçrn.
Dexwazîn: mêşk û hizrî kûrdaney resen-

man le hegbey em sefere sexte binên
Dexwazîn: ew tembûraney ke le temenî

sawaytîw le qonaxî
Daredaredan le amêzî zimanî şîrînî

Kurdîda girûgal biken
Çünke ke çewit helkşan iydi rasit

nabnawe.
Dexwazîn: Ziyatr û ziyatr dexwazîn

Gelo... bazewy ew baxçe rengaw renge
Be awy sazgarî Kûrdistan têr aw bêt,

Ta ziyatr û çaktr gûlî alû walaw,
Be bonû beramey xoş le amêz binêt.

Ew holane bihejênin ke le derwazeyan
awdîw debîn

Wabêt danîştîwanî hest biken:
Lenaw çîya w le nawendî şerî

pêşmergedan,
Çünke:

(Doza me tim serxobûne...
netalane, nekûştin)*

Gelî brayne: emro berprsiyekî gewre
Le estoy êwe daye w be milyonan

Kûrdî tînuî azadî
Çawyan lew tembûr û lew male

brîwe ke ewey le amêzdan,
Êweş debê: ew berprsiye le hemû sat

û kat û cêgakanda
Bihênnewe berçawî xotan.

Êweş debê: dest lemilanî çand û folklor
û dîrokî

Resenî netewe keman bibin
Êweş debê: herdem kemasiyekanî xotan

Çabîken û bexoda biçnewe.
Êweş debê: tembûrekantan tifenig asa

Temaşa biken
Çünke zor mezinin û mayey tirs û

dûdîlîn bo dûjmin...
Belê ew tembûrane mezinin..

le tifenig mezintr
Eger na... be tifenig û polîsewe

rû be rûyan nedebûnewe....

Pismam

* Dêre helbestêke le stranêkî Koma
Çîya (NCM)



Bakurê Kurdistanê û zimanê Kurdî

Sîrwan Reşîd

Kitêb û defter û tarîx û kaxez
Bi Kurdî ger binûsroye zemanî
Mela û zana û mîr û padîşah man
Heta mahşer dema naw û nişanî

Hacı Qadirî Koyî

Bakur serê laşê me ye, Bakur çavê me ye û em bêçav nikarin di rê de herin. Bakur hêviya mezin a Kurdan e û hwd. Rast e, em hemûyan jî qebûl dikin û jê re nabin asteng. Lê bakurê Kurdistanê an jî dewletek ger ku dev ji zimanê xwe berda û bi zimanê biyanî- ku ew jî zimanê dijminê wî be- bipeyive dibe wek mirovê ku li ser daran bi rê ve diçe, an jî kor e û nebîne ku xelk pê digire û wî dibe tîne. Xala mebest, li serê rawestîna û axaftin di vir de ye. Mebesta serekî zimanê şîrînî Kurdî ye û pîrsa me jî ev e.

Ji bo çî di serê vê Kurdistanê de zimanî Kurdî hatiye hilanîn? Çima?

Niha dizanim, tu, ew û hûn jî vê pîrsê dixwînin û yekser vê hincetê didin pêş ku li vê beşa axa welêt zimanê Kurdî qedexe bûye. Baş e birano, ez dizanim. Ez jî Kurd im, dîr û nêzik xwexwarê wê zilmê me ku li gelê min tê kirin. Lê bawer bikin ev nabe sebebê wê yekê ku pîrriya miletekî dev ji zimanê xwe berde, kanê ewên ku li ber xwe dan, kanê welatparêzî?

Eger mirovan di bin zilm û tehdeya dijmin de zimanê xwe yê şîrînî jî bîr kir, divê em bibêjin ku neyar gihiştîye armanca xwe. Lê êdî ez bi xwe nizanim bibêjim çî. Eger hincet (behane) qedexekirina ziman be, li rojhilatê Kurdistanê jî rewş wisa ye û zimanê Kurdî qedexe ye. Lê şerm e, fediyeke mezine heke li Mehabad, an li Saqiz an jî li Banê û hwd. Kurdek bi zimanê Farisî biaxive (ku

hemû jî bi Farisî dizanin). Ne ku her ev bi tenê, ku gelek zanayên zimên ên Kurdî li wê beşê hene ku xizmeteke mezin bi zimanê me kirine. Me got û dîsa dibêjin Bakur seriyê laşê me ye. Ev rast e, lê nerast û durist jî ev e ku, serê me bi Tirkî bipeyive. Çunkî diyar e ku serî bingeha bîrkirî biryardanê ye. Di wir de jî hemû tişt diherikin. Ku wisa be divê çareyek jî vê mijara tirsnaq re bê dîtin.

Gelî dilşewatên gelê min, ji mēj ve hatiye gotin, ziman movika piştê ya millet e, ziman reha mirinê ya neteweyê ye, ziman pênasa gel û hwd. e. Hûn van tiştan jî min baştir dizanin. Dizanim heke ku ziman girîng nebûya dijmin bi evqas cure û hemû hêza xwe ve sîcekî wiha mezin lê nedikir ku heftê salî zimanê gelekî resen qedexe bike. Bi ya min ev yek jî qirkirina Helebçeyê ne kêmîr e, lê dibe ku zêdetir be.

Hin kes hene, gava ji wan re tê gotin bê çima bi Kurdî napeyive, gotina wan amade ye. Dibêjin ez Zaza me (Dimilî me). Dixwaze bi hincetan, xwe rizgar bike, lê dema tu jê peyvandina bi Dimilî dixwazî, tu lê dinîherî ku bi wî jî nizane.

Di ser van yekan re jî îro derdê me ew e ku başûr û rojhilatê welatê me jî tipên Latînî bi kar bînin. Di gel vê rewşê, Kurmanciya me ne di rewacê de ye. Kêm kes pê dixwînin û dinivîsin. Di rewşeke wiha de ku ne di rê de ye, mafê me heye ku em bibêjin. Birano! Dev ji me berdî û ji me vegerin. Welehî li vir ku Kurmancî neyê xwendin Soranî qet lê ji nayê nêrîn. Sernivîsan jî naxwînin.

Kes ji me li hember dernakeve ku îro li Bakur şoreşeke mezin û têkoşîneke xurt heye û hêviyeke me yî mezin pê heye ku wê tava azadiya me bi dest bixe, gelo karê me heta niha çî bûye ku awireke li vê gelşa

zimanê nehatiye dayîn?

Nizanim mirov bikaribe bi Îngilîzî, Tirkî, Erebi, Farisî û hwd. bi çakî fêr bibe û pê biaxive, binivîse, lê pê re ji bo çî nikaribe zimanê dayîk û bavîkê xwe hîn bibe.? Bi rastî seyr (ecêb) e!!

Eger zimanê Tirkî, zimanekî resen (bi esil) û xurt bûya qey nake. Heke zimanê Tirkî jî zimanê me şîrîntir, paktir û dewlemendtir bûya, her qey nake, lê tu rabî vî zimanê me yê ciwan û nazik biavêjî û wê Tirkiyê bikî wirdê ser zimên!

Îro beşeke pîr ji rojavayê welatê Ereban di bin tesîra zimanê Fransî de ne, bi wî zimanî dipeyivin ku ne kareki rast e, lê niha spasî divê, lewre Fransî li ku ye, Tirkî li ku ye?

Xizimino! Ez bawer im ku tu hincet di cihê xwe nîn e, ji bo bikarîna zimanê zikmakî. Hemû hincet ne di cih de ne û seqet in û ziman ne ew tişt e ku li serê danûstandin çêbibe.


Birakino! Ez çavên we maç dikim û bi vî zimanî gazî li we dikim. Min xwe avêtiye bextê we, li zimanê xwe xwedîti bikin. Efyona zimanê Tirkî zimanê me avêtiye pişt guhan. Divê ev wiha neçe, ew qeşem bê şikandin. Axir birano, çawa em bi Kurdistanê dilê xwe xweş dikin ku pîrriya gelê me li vir, di nav vê pîrriyê de jî gelek ji wan bi zimanê dijminêkî serhişk û serero diaxivin.

Birakino, ev karesat li vir hewce dikir ku em zêdetir bi kurtenivîsekê li serê binivîsin. Lê, bila ev kilîta vekirina mijareke bi derbest û bi lez be. Li ser vê karesata malwêranker. Da ku parçeyek mezin û zindî ji destê me neçe. Belê ger Kurd e bi Kurdî nizanibe ji dest diçe.

Bi hêviya wê rojê ku hemû Kurd bi Kurdî mijûl dibin û zimanê Kurdî jî zimanê Tirkî kêmîr nabînin.

Zanistiya dîrokê

'Dîrok: Têkoşîna navbera çînan'



■ Carekê her ku dihere, xezîneya zanîna mirovatiyê dewlemend dibe. Zanyariya mirovatiyê bi pêş ve dihere. Bi vî awayî kemî û qewîtiya raman û zanistên berê derdikeve. Lê berî her tiştî jî, çînen serwer ê mijokdar ji bo ku serwertiya xwe biparêzin, zanyarî girtine bindestê xwe. Ji bo berjewendiyên (menfîetê) xwe, zanyariyê xerab dikin û di dîrokê de tim wiha kirine. Bi vî awayî dîrok û zanyariya dîrokê hilgirtine bindestê xwe û hîn jî wilo dikin.

■ Dîrok, pêşî li Kurdistanê (Mezopotamya) destpêkiriye. Çimkî pêşî, nivîsandin li Kurdistanê, di B.Z. hezar sal çaremîn de (B.Z. 3300-3100) derketiye holê. Li welatê din destpêka dîrokê cuda ye. Mînak; li Misrê, B.Z. hezar sal sêyemîn (B.Z. 2800- 2500), li Anatoliyî û Çînê B.Z. hezar sal duyemîn de (B.Z.1500) nivîsandin derketiye holê.

Mahmut Yıldız

Heya îro gelek mirovan, "dîrok" salix daye. Her yekî jî wek xwe salix daye. Sedemê salixdanê yên cihêreng hene.

Carekê her ku dihere, xezîneya zanîna mirovatiyê dewlemend dibe. Zanyariya mirovatiyê bi pêş ve dihere. Bi vî awayî kemî û qewîtiya raman û zanistên berê derdikeve. Lê berî her tiştî jî, çînen serwer ê mijokdar ji bo ku serwertiya xwe biparêzin, zanyarî

girtine bindestê xwe. Ji bo berjewendiyên (menfîetê) xwe, zanyariyê xerab dikin û di dîrokê de tim wiha kirine. Bi vî awayî dîrok û zanyariya dîrokê hilgirtine bindestê xwe û hîn jî wilo dikin.

Yên xwedan namûsa zanyarî, wek awirê mijokdarê serwerê mirovatiyê û gelan, li bûyeran û dîrokê nanêrin. Armanca zanyariya dîrokê nakin berdestê zaliman. Awirê kedkar û gelê bindest cihêreng e, zanyarî ye, piştî xwe dide

rastiyan.

Ger bi awirêkî wiha li dîrokê were mêzekirin. Ev peyvên Marx, dîrokê bi kurtasî bi me salix dide; "Dîrok, têkoşîna çînan e".

Dîrok, weke çîrokeke ya paşeroj (buhertî) bi mirovan dide hînkirin, ya îro di de famkirin û dibe ronahiya dema kubê. Lê belê rêszayîyên (qêdeyên) dîrokê jî hene. Li gor van rêszayan tê lêgerîn.

Marx û Engels di "Bîrdozza Almanî" (Alman Îdeolojîsî) de wiha dibêjin:

"Dîrok navgîn, sermaye û hêzên hilberînê yê ku ji nişên berê de hatine wergirtin û her nişekî di dewrana xwe de xebitandine bêhtir tiştêk nîn e".

BABETA DÎROKÊ

Babeta dîrokê mirov in. Lê belê mirov tenê nîn in. Ji xeynî wan jiyana mirovan ya aborî, civakî û ranyarî (polîtîk) jî. Ev sereqet di tevgerê de ne û diguherin. Dîrok, van bi belgeyan (wesîqa) derdixe holê. Cih û dem jî bi mirovan rayê dide (nîşan dide).

DÎROK KENGÊ DEST PÊ DIKE?

Wexta ku Marx digot

"dîrok, têkoşîna çînan e" dixwest vê yekê bibêje:

"Dîrok, bi civaka çînî ya pêşîn, ya koletî re dest pê dike.

Lê berî vê civata koletî jî, mirov dijîn. Paşeroja mirovan heye. Zanistvan ji bo vê demê dibêjin, "berî dîrokê (Prehîstorîa)." Di berî dîrokê de çînan tune ne. Komên hov ên pêşdarî hebûn. Ev jî, ji du deman tê holê.

Yekemîn; dema hovîti (Ev dem sê merhale ne: Hovîtiya xwarê, hovîtiya navîn, û hovîtiya banî). Ji bo vê demê, dem ya "paleolîtîk" jî tê gotin.

Duyemîn; dema barbarîyê (sê merhaleyê vê jî hene: Barbarîtiya xwarê, barbarîtiya navîn û barbarîtiya banî. Ji bo vê demê, dem ya "neolîtîk" jî tê gotin.

Piştî "dema barbarî" yê pê de, "avayî" tê. Ev, "destpêka dîrokê" ye.

DÎROKÊ PÊŞÎ LI KU DERÊ DEST PÊ KIRIYE?

Dîrok, pêşî li Kurdistanê (Mezopotamya) destpêkiriye. Çimkî pêşî, nivîsandin li Kurdistanê, di B.Z. hezar sal çaremîn de (B.Z. 3300- 3100) derketiye

holê.

Li welatê din destpêka dîrokê cuda ye. Mînak; li Misrê, B.Z. hezar sal sêyemîn (B.Z. 2800- 2500), li Anatoliyî û Çînê B.Z. hezar sal duyemîn de (B.Z.1500) nivîsandin derketiye holê.

Tê xuyanî ku li her welatekî destpêka dîrokê cuda ye. Lê dîrok pêşî li welatê Kurdistan destpêkiriye. Kurdistanê şewqa (tîrej) xwe daye dinê.

Dema ku dewleta Kurdistan (Medan) B.Z. 550'an de hate herifî, Kurdistan û mirovatiyê gelek tişt winda kirin. Arkeolog Sabatino, di pirtûka xwe ya bi navê "Mezopotamya Sanatîni Taniyalim"(Em pişeyê mezopotamyayê Binasin) de wiha dibêje: "Qedaniya avayî ya Mezopotamyayê, dema ku dewleta Kurdistan (Medan) herifiyê ye".

Îro bi navgîna têkoşîna neteweyî ya hemdem gelê Kurdistanê di Rojhilata Navîn û dinê de dîrokeke nû dinivîsîne. Ji xeynî vê, em yeqîn dikin ku wê "zanistiya dîrokê" jî bi pêş ve bibin.

Eliyê Evdirehman

Afirînerê 'Şer Çiya De' êdî nîn e

■ Şair, nivîskar û romannivîs Eliyê Evdirehman di hemû berhemên xwe de li ser dîrok, çand, merxasî, serhildan, têkoşîn, welatpareziya Kurdî dinivîse. Ta niha 13 pirtûkên wî hatine weşandin. Gişt bi Kurmancî û alfabe Kirilî ne. Di gel pirtûkên wî yên şîir, roman û cerbîneyên wî yên navdar romana wî ya berhemên wî yên roman jî hene. Di nav berhemên wî yên navdar de romana wî ya "Şer Çiya De" zêdetir tê najîn. Ev romaneke dîrokî ye, li gel wê "Fatê Xanim" cerbîneya wî ya romane jî heye û tê de bîrîkirina şerê rizgarî, qehremaniya gelê Kurd hatiye honandin.

Zana Farqînî

Guleke edebiyata Kurdî çilmisî, stêrkeke din ji xwricî ji kurahiya wêjeya Kurdî. Piştî Apo (Osman Sebrî), nivîskar, romannivîs û şairekî Kurdî mezîni Eliyê Evdirehman di 21.1.1994'an de li Bakûyê ji nav me bar kir û çû ser dilovaniya xwe. Êdî nivîskarê romana "Şer Çiya De" ne li nav me ye. Mamoste Evdirehman di sala 1989'an de ji Ermenîstanê tevî malbata xwe ve koçî Bakûya Azerbeycanê kiribû. Ji ber ku di navbera şerê Ermenî û Azerîyan de pêkûfî li Kurdên misilman dibûn, gelek malbatan ji Ermenîstanê koç kiribûn.

ELİYÊ EVDIREHMAN KÎ YE?

Malbata Eliyê Evdirehman, ji ber zilm û pêkûtiya Osmanîyan wek gelek malbatên Kurd

ji Serhedê koçî Rûsyayê dibin. Piştî ku Artêşa Osmanîyan ji ser gelê Ermenî vedigere berê xwe ber bi Kurdan ve dizivîrîne û gelek qirkirinan pêk tîne. Di wan demên dawî yên Osmanî de gelek Kurd ji Serhedê; ji Qers, Wan, Bazid, Îdirê û deverên din ji ber sîtemkariya Osmanî xwe avêtinê bextê Ermenîstanê. Bi taybetî ji beşek e mezinî Eşîra Birûkî koçî Ermenîstanê dibe. Di nav malbatê koçîrî yên Kurd de malbata Eliyê Evdirehman jî heye.

Li gorî texmînê, di salên 1920 de li bakurê Kurdistanê, herema Serhedê ji diya xwe dibe. Xwendina xwe li Ermenîstanê diqedîne û li gundên Kurdan dest bi dayîna dersên bi Kurdî dike. Demeke dirêj di rojnameya "Riya Teze" de nivîskarî û nûçevaniyê dike.

BERHEMÊN WÎ

Şair, nivîskar û romannivîs



Eliyê Evdirehman

Eliyê Evdirehman di hemû berhemên xwe de li ser dîrok, çand, merxasî, serhildan, têkoşîn, welatpareziya Kurdî dinivîse. Ta niha 13 pirtûkên wî hatine weşandin. Gişt bi Kurmancî û alfabe Kirilî ne. Di gel pirtûkên wî yên şîir, roman û cerbîneyên wî yên navdar, berhemên wî yên romaniyê jî hene. Di nav berhemên wî yên navdar de romana wî ya "Şer Çiya De" zêdetir tê nasîn. Ev romaneke dîrokî ye, li gel wê "Fatê Xanim" cerbîneya wî ya romane jî heye û tê de bîrîkirina şerê rizgarî, qehremaniya

gelê Kurd hatiye honandin.

Hin pirtûkên wî yên şîir jî ev in: Kulîlka Çiya, Îhtiram, Emir Gul vedide. Îhtiram li zarê Azerî hatiye wergerandin.

"ŞER ÇIYA DE"

Ev romana wî ya navdar ji 460 rûpelan pêk hatiye û li ser serhildana Kurdan a Girîdaxê (Çiyayê Agiriyê) ye. Serhildana Kurdan a sala 1930 yî. Îhsan Nuri Paşa, Biro Heskê Telî, Şêx Zahir (ku gernasê romanê ye) Îbrahîm Axayê Bazidî, xwe-firoşên wê domê Edoyê Hesen û İsa Beg... Gişt ji nû ve ji a-

liyê Eliyê Evdirehman ve tîn vejyandin.

Rewş û serpêhatiya Şêx Zahir bûye kilam û ketiye ser zaran:

Şêx Zahir kire gazî: "çê bin, çê bi xebitin

Jor qeweta me Xwedê ye, jêr guman Kurd in

De fedayîno lê xîn, bav û birano lê xîn

Piştî eskerê Kemal bistînin revê pê xîn

Nav û dengên Kurdan li dinê xîn.

Nivîskar û lêgerîner Rohat di Kovara Berbang de (sal 9, hejmar 5/90 (66), Îlon 1990) gotarek li ser romana wî bi navê "Çiyayên ku merxasî bi çavên xwe dîtine, li ser romana Eliyê Evdirehman" dinivîse. Ew bi vî nivîsara xwe, romanê ji her aliyê ve dinivîsîne. Wek, "Mirov eger romanê bi nav bike wek "romaneke dîrokî" ye. Çawa tê xuyanê, nivîskar di derheqê dîroka ve serhildanê de (mebest ji serhildana Agiriyê R-W) baş kûr bûye, vekolandiye, lêgerînên fireh berî nivîsandina romanê pêk anîne. Bi gelek kesan ve deng kirine, gelek dokumantên arşivan li ber çavan derbaz kiriye, teşe û cureyê wê diyar kiriye. Ji aliyê wêjeyî (edebî) ve jî ev nixandî li serê kiriye: "Roman her çiqas romaneke dîrokî û şer be jî, car-carina Xemil û nexşên tebiyetê bi destê Eliyê Evdirehman xweştir, rindtir dibin, wek tasvîrkirina danê êvarê: "Royê êdî guliyên xwe yên zêrîn hindik ma bû ji erdê berev bikira."

Zarok

(Kurmancî)
Zarok ji dengê
ZîvîNî yê kevokê
Tu car tînahîjê
Lê belê dizane
Çima bilind difire...

Zarok ji gujeguja
Spî û nerm ya bayê
Tu car tînahîjê
Lê belê dizane
Ba bi dafikê nayê girtin...

Zarok nakokiya
Netewetiyê û çînayetiyê jî
Dibe ku nizanibe
Lê belê dizane
Balefir çima
Asoyê samal* û
Tank jî çima derdora
Gund digire.
* Asîmanê şîn û sayî

Minal

(Sorani)
Le dengî zîwînî kotir
Hergîz tînaga
Belam dezanê
Bo beriz defrê...

Minal
Le wijey spî û nermî ba
Hergîz tînaga
Belam dezanê
Ba daw naygirê...

Minal
Nakokî netewayetî û
Çînayetîş her renga nezanê
Belam dezanê
Firoke boçî asoy samal û
Debabe boçî dewrî dê
degirê...

Letîf Helmet
Wergêr: Pismam

Kevn û nû

Ez û bavê xwe rûniştin, du ramanên ji hev dûr in
Ez im xortê dema nû, ew melayekî pîrr misilman e
Civan im, agirê xortaniyê xurt e di dilê min de
Çi tîştê ew dibê zor e, li ber çavê min hêsan e
Di ramanên xwe de rengê telên darên biharê me
Belê ramana bavê min ji textê Sendel û Zan e
Dixwaze ez wekî wî bim, bi çavê wî binêrim tim
Çi ramana bibîne ew ji min re fikr û raman e
Ji min re bibêje reş gewr e divê ez jî wiha bibêjim
Çi tîştê ew bibê rast e, nebêjim ez ji wîran e!
Kitêbên ew dixwîne tev zer in rengê rûyê miriyan
Kitêbên ew dixwînim wek spî berfa li zozan in
Dema rokê di dest min de dibîne wan kitêbên xweş...
Nizane bê çî tê de ye dibê: "Tev de ne hêja ne!
Dibê: "Azan dide rabe limêj bike", lê nizane ku
Tîfîngan destê partîzan ji min re bang û azan e
Bihuşta min li erdê ye, ew e çaxa bibînim ku...
Welatê serbixwe lê bû... bihuşta wî li ezman e
Li ba wî jîn; mirov bédeng bijî ta rojekê bimire
Li ba min jîn; xebat û kêferat û xwîn û xwedan e
Wiha cihan e kevn û nû belê kevnar diçe nû tê
Ji mêj ve ew bi dijwarî li hember hev di şer de ne.

Cengî

Ma biratiya gelan ev e?

Mahmut Dunlayici

Îro di roja me de li ser navê biratiyê durûtiyeke ecêb tê kirin. Yê ku heya doh ji navê Kurd û Kurdistanê re tehamul nedikir wekî dibêjin: "Ev nehse sal e ku em bi hevdu re dijîn, me qîz dane hev, xwîna me li nav hev ketiye" bi gav û saet dibêjin: "Em birayê hev in", "Tu cudahî di navbera Kurd û Tirkan de tune ye." Erê bi dev wisa dibêjin lê emelê wan pîrr eşkere dibêje: "Kurdê herî baş ê mirî ye, an jî Kurd ku xwe Tirk dihesibîne yê herî baş e" wekî din jî tu rê tune.

Türkeşê faşîst dibêje: "Yekî Kurd çiqas Kurd e ez jî ewqas Kurd im, ez çiqas Tirk im ew jî ewqas Tirk e." Lîstika "MGK"ê dibêje, "Em însanê xwe yên rojhilat û rojava bi dilekî hembêz dikin." Cardin Siloyê Kurdunde, gavanê doh, Reîscimhûrê îro dibêje, "Ê ewilî rastiya Kurdan nas kir im in" û gelek rîştên wek van tên gotin. Bî rasî mirovekî xerîb van gotinan bibihîze, ewê ji xwe re bibêje, "Dewlet tu çi dahiyê naxe navbera Kurd û Tirkan." Lê divê

■ Biratiya rast biratiya gel e, ev biratî jî wê bi destê pêşevaniya gel bête avakirin. Ev panzdeh sal e têkoşîna ku li dar ketiye banga gelê Kurd e li ser navê biratiyê, Hereketa Rizgariya Netewe armanca xwe ya yekemîn jî bo damezirandina welêt û gelekî serbixwe tîne zimên. Em dizanin biratî di rewşeke wekhev de ava dibe. Rewşeke wekhev bi têkoşînê tê avakirin. Di vê têkoşînê de divê ew kesên li ser navê gelê Tirk xwe "şoreşger" dibînin, xwe "rewşenbîr" dibînin, li nik gelê Kurd cihê xwe yî bi rûmetî bigirin. Bi kîjan warî ve binêrin biratiya ku mafê gelê Kurd û gelê Tirk biparêze, bi vî awayî ye.

mîrov li rastiye binêre, roj tune ku li Kurdistanê gund neyên sotin, kalên heftê salî, zarokên donzdeh salî pîrekên bi wext, xortên wek fêrisan bi destên kontrgerîla û cerdevanan, bi hovîti neyên kuştin, roj tune ye ku bi sedan mîrov neyên girtin û di lêdanê re derbas nebin, roj tune ye ku bi sedan însanan navêjin girtîgehan.

Ev rastî dide xuyakirin ku "ev biratî", biratiya ku ji Kurdan re dixwazin, bi çi rengî ye. Biratî bi fen nabe. Biratî ne wek "biratiya dûpişk û beqê ye", biratiya ku hûn dixwazin ne fen be, ew hivdeh mebusên DEP'ê yên ku di hilbijartinê de bi rayê "birayên we" hatine hilbijartin, çi-

ma li ser navê biratiyê xebardana wan weke şujînê di hêta we de radibe û hûn dikin qîreqîr. Ji aliyê din ve rojnameya "Özgür Gündem" jî ber ku hovîtiya ku li Kurdistanê tê kirin, so-tandina gund û navçeyan, kuştina kal û zarokên di pêçekê de tîne zimên, roj-namevanê wê tîne qetilkirin, tete hevdan, bi zilm û zordariyeke hov tîne xwestin ku çapkirina wê bête rawestandî û qedexekirin. Ji ber van bûyeran em dibêjin biratî ne ev e. Biratiya rast biratiya gel e, ev biratî jî wê bi destê pêşevaniya gel bête avakirin. Ev panzdeh sal e têkoşîna ku li dar ketiye banga gelê Kurd e li ser navê biratiyê, Hereketa Rizgariya Nete-

we armanca xwe ya yekemîn jî bo damezirandina welat û gelekî serbixwe tîne zimên. Em dizanin biratî di rewşeke wekhev de ava dibe. Rewşeke wekhev bi têkoşînê tê avakirin. Di vê têkoşînê de divê ew kesên li ser navê gelê Tirk xwe "şoreşger" dibînin, xwe "rewşenbîr" dibînin, li nik gelê Kurd cihê xwe yî bi rûmetî bigirin. Bi kîjan warî ve binêrin biratiya ku mafê gelê Kurd û gelê Tirk biparêze bi vî awayî ye.

Lê çi mixabin e, îro gelek mîrovên navê "şoreşgeriyê" li xwe dikin; ji bo ku dewleta xwe ji sikratê xelas bikin li gel dewletê cih digirin û êrîşê tînin ser Hereketa Rizgariya Nete-weya gelê Kurd. Rûyê xwe yê Kemalîst eşkere dikin. Navê wî emelê wan navê "şoreşgeriyê", parastina dewleta faşîst e.

Ji aliyê din ve dewleta kedxwar li pêşberî têkoşîna gelê Kurd ketiye tengasiyeke mezin û mirina xwe bi çavên xwe dibîne. Ji bo ku karibe temenê xwe çendekî din dirêj bike dirhem dirhem xwe difiroşe. Destê xwe diavêje xwe-firoşên Kurd. Çend kesên wek Tahirê Kerro (Tahir


Adiyaman) derdixê TV'yên xwe û bêeyb û bêfedî dibêje; "Em birayên hev in." Rûreşiya hîn mezintir; di vê rûniştinê de "profesor" Ruşen Keleş di dilê xwe de rewşenbîr e weke kundan dibêje, "Ez îro pîrr kêfxweş im ku vê gav di TV'ya dewletê de hevlekî min î Kurd bi zimanê xwe yê zikmakî axaftin kir." Ev bûyereke bi tenê ye, mîrov kare bi hezaran mînakan bide, lê bi serê xwe ev bûyer jî dide xuyakirin ku dewleta Tirk û "rewşenbîrên" Tirkan çiqas bi hev re girêdayî ne. Bi rastî ev jî bo mirovatiyê rûreşiyeye pîrr mezin e, lewre rewşenbîr jî bo gelê xwe yê di reş û tariyê de divê bibe ronahî, mafên gelê tirs biparêze. Lê çi mixabin mînaka li jor jî dide xuyakirin ku "şoreşger" û "rewşenbîr" ên Tirkan hebûna xwe di hebûna dewletê, mirina xwe di mirina dewletê de dibînin. Dûrketina wan a jî însaniyete jî, di vir de veşartî ye. Lê em bawer in wê gelê Tirk rêber û rêzanê xwe derxin. Biratiya gelan bi rûmetî û bi ser bilindayî wê bi yekîti, îtifaq û eniya gelê Kurd û gelê Tirk ava bibe.

XAÇEPIRS

Amadekar: Rasto Zilanî

Çeperast: 1-Serokê Giştî yê DEP'ê, di wêneyê de tî dîtin 2-Eşq/ Vekişandina lêkera "anîn"ê di dema borî de 3-Tîştê ku sîr pê tîne kutan/ İzin, musade 4-Ezman/ Dijwateya dereng 5-Miya nêr/ An serxwebûn an ... 6-Wext/ Cînavkek 7-Taybetiya ku ji nîjadê ve tî/ Di muzîkê de îşareta rawestîne 8-Çeper 9-Kesê jî hevketî û bîrêkûpêk 10-Agir/ Cejn

Serejêr: 1-Kevçiyê mezin ê dar ku ji bo mehîr, dew an jî şorbeyê tî bikaranîn/ Mastara lêkera "dîtin"ê/ Kêfxweş 2-Rengdêra "av"ê/ Kesê ku por û rihê mêran kurr dike 3-Çeka ku bi kevanê tî avêtin/ Hempa 4-Nepejirandin/ Roja em tî de, ev roj 5-Kurtnivîsa Dewletên Yekbûyî yê Amerîka bi İngilîzî/ Kurtnivîsa Rêxistina navneteweyî ya Rojnamevanan bi İngilîzî 6-Vekişandina lêkera "danîn"ê di dema niha de ji bo cînavka sêyemîn/ Xebat, emek 7-Roja ku ji bo misilmanan pîroz e/ Şirove 8-Malên nêzîk/ Bi mebesta ji piyasê vekişandinê komkirina tiştêkî 9-Di zimanê devkî de bi wateya feqet, lê belê, tî bikaranîn 10-Dinya/ Endam 12-Dilovan



BERSIVA XAÇEPIRSA HEFTIYA ÇUYÎ

Çeperast: 1-Danton/ Endam 2-ÎRA/ Nû/ Terzî 3-Na/ Duryan 4-Ognî/ Raser 5-Zoolojî/ Sak 6-On/ At/ Me 7-Eros 8-Amedî 9-Kat/ Ar 10-Atlantîk

Serejêr: 1-Dînozor/ Ka 2-Aragon/ Mat 3-Na/ No/ TL 4-Dîlara 5-Onu/ Otoman 6-Nûroj/ Sert 7-İm 8-Etar/ Enîşk 9-Nenas 10-Dr/ Sa 11-Aztek 12-Mî

KARTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

Bedelê abonetiye razînin:

Li derve: Mazhar Günbat

İş Bankası Cağaloğlu Şub. Şube No: 1095

Döviz tevdiat Hesap No: 3138437

Li Tirkîyê: Mazhar Günbat

İş Bankası Cağaloğlu Şub. Şube No: 1095

Hesap No: 0408342

Ji kerema xwe re cihên li jor vala dagirin û tevî kopiyeke pelê razandina bedelê abonetiye bişînin.

Navnîşana Welat: Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Daire No:14 Cağaloğlu / İstanbul
Tel (Fax) 511 50 07

Mercên abonetiye:

	Li hundir	Li derve
3 meh	120.000	50 DM
6 meh	240.000	100 DM
12 meh	480.000	200 DM

*Mirîşka newêrek û rovî***Li hewşê kire qit qit tiştêkî li dû got 'pit'**

Xuya nake li der dor
Ew mirîşka nikil sor

Lew gelek bêzirav e
Newêrek û dilxav e

Lê ew çi bike ev zirav
Standiye j' dê û bav

Heta ku çîçik bû ew
Bi wan çîrokên derew

Diya wê ew dixapand
Di binisa ditirsand

Her şev digot: "Keça min
Tu guhê xwe bide min

Ew dijmînê me kî ne?
Mar û teyr û rovî ne

Li nava giya û pûş
Mar dikine xuşe xuş

Teyr li hewa difirin
Bi pirtik û bi perr in

Rovî guhbel, poztûj in
Dûv dirêj, simbêl şûj in

Ku xuşe xuşek were
Siyek ser te re here

Bizanibe an mar e
An jî ew teyrê har e

Lê ku ne teyr û mar be
Ger roviyê bêar be

Cihê xwe biguhêze
Xwe ji wan biparêze

Êdî her tim bi pirs be
Ji siya xwe bi tirs be."

Heta ku ew bû zîxan
Jiyan li wê bû zîndan

Ku xişpênêk bihata
Ziravê wê diqeta

Mîna li ser agir bû
Dê li ku ba li wir bû

Lê niha dê tune ye
Êdî bi serê xwe ye

Ji hêkan dagirt hêlîn
Bû kurk çêlî deranîn

Çîçik deranîn ji lîs
Hemû wek gulokên rîs

Li hewşê kire qit qit
Tiştêkî li dû go: "Pit"

Nizanîbû bê çi ye?
Li dû xwe nenêriya

Qîjçî kir û li xwe da
Ber bi lîsa xwe bazda

Çîçikan bi çîrewîr
Tev belav bûn li hawîr

Lê çîçikêkê nêrî
Got: "Yadê xwelî serî

Netirse va kuliyek
Ezê bikim pariyek."

Çîçikê kulyê neçar
Kire pariyek û xwar

Mirîşkê pîrr fedî kir
Bi gilî û bi nîfir

Got: "Mîna we bav û dê
Xwedê bi kesî nedê

We ez bêzirav kirim
Bêesil bênav kirim

Çîçika min ya zelût
Ez kirime mîna hût

Tirsa dilê min şikest
Ser min rabû xof û pest

Êdî ez bi qewet im
Ji dijmîn bêminet im."

Demek xweş borî li wan
Çîçik tev bûne zîxan

Şevêkê bûye dereng
Kete guhê kurkê deng

Ji xwe re got: "Hinek in
Li derî dixebitin

Derî vekir nêriya
Got: "Wey li min rovî ye!"

Xwe piz kir û da qîjan
Agir ji çavan rêjan

Baskên xwe li hevdu dan
Hawîr kir toz û duxan

Rovî li cih şiliya
Qerem hew lê geriya

Mirîşk wek teyrê sîmir
Xwe di çavên wî wer kir


Xwe avêt stûyê rovî
Nikil duran çavê wî

Zîxan li ser kom kirin
Herdu çav lê kor kirin

Gelî zarokên hêja
Jîr Dilovan dibêje:

"Heta ku tirs hebêt in
Tu car nabe serkeftin."

Jîr Dilovan



Jixwe di mal de jî kes bi Kurdî qise nake

■ Diya Ferdî got: "Birayê min beriya ku lawik here dibistanê kîjan mêvan dihate mala me, wek ku marîfetek be pê re bi Tirkî dipeyivî, pê şa dibû. Jixwe ku çû dibistanê îca nema bi Kurdî peyivî, niha zarok tev jî bi Kurdî fêm dikin, lê mixabin yek jî nikare bipeyive..."

Vê hefteyê emê herin cem hin malbatên Kurd ên ku bi nav "di navenda" bajêr de dijîn, ka şertên jiyana navenda bajêr çawa ye emê ji wan hîn bibin.

Li Stenbolê taxa Tozkoparan ku li ser navçeya Merterê ye, beriya bi deh salan nêzî 10 avahî bi sedema ku kevnare bûne û di talûkeyê de ne, ji aliyê belediyeya wê wextê ya herêmê ve, tîn vale kirin. Ji ber vê yekê xwediyên avahiyan û yên ku di menzelên wan de di kirê de bûn, ji avahiyan dertên. Dawî serokê belediyeya vê navçeyê diguhire û ev der jî wiha vala dimîne. Piştî bi çendekî hin malbatên Kurd ên ku li Stenbolê dijîyan û rewşa wan xirab bû, ew der kifş kirin û mala xwe anîn xistinê. Ji ber ku kesî dengê xwe ji wan re dernexist, şandin pey lêzim û dostên xwe jî, da ku werin û ew jî di van avahiyan de bimînin.

Hin ji wan malbatan ev 10 sal in ku di van avahiyan de dijîn û ji jiyana xwe jî memnûn dixuyan. Lê nizanin ku ew avahî bêne xwar wê çi bi serê wan de bê.

Mala ku vê hefteyê em çûnê jî, yek ji wan malan bû. Çawa digotin ev deh sal e ku di vir de dijîn. Heta niha qet ne kirê dane û ne jî heqê av û elektrîkê. Kes li wan jî napirse. Bi gotina wan ku T.V û rojnameyên Tirk jî bela xwe ji wan vekin. Jinika malê digot: "Birayê min Xwedê mala wan xera bike her heftî an deh roj carekî wê rajin kamefayên xwe û bèn me tevan kom bikin û wêneyên me bikşînin, carina çend pirsan jî, ji me dikin û dawî dibêjin: "Wê we ji vir derxinin." Em nizanin ka çi ji me dixwazin?! "Her mala ku di vir de dijîn bi hindikayî 5 zarokên wan hene, her maleke kufletek di stûyê wê de heye."

Me jî Jinikê pirsî: "Talûkeya van avahiya heye, ger ku tune bûya Belediyeya vê derê beriya

deh salan xwediyên avahiyan û nêzî 100 malbatên din ji vir dermedixistin, lewre wexta em ketin deriyê avahiya yekemîn me jî bawerî pê anî ku, ev der ne cihê jiyane ye, mirovan ditirsîne, qey hûn natirsin?"

Bersiva jinikê ji dil û di cih de bû: "Ka cihekî ji vir çêtir ji me re bibîne bi soz emê herin wir. Qey em naxwazin di xaniyê xweş de bin, qey em nizanin ku talûkeya vê derê heye, lê heçî hûn in pirsra we hazir e."

Xaleta Gûlê jî got: "Lawo ev du meh e ku mêrê (jinika xwediyê malê) wê yî girtiye, de ku wan heqê kirê, av û elektrîkê bidana, wê ji ku bianîna, qenê li vir ew tune. Û Xwedê mala wan xera bike ku îftira li xelqê dikin."

- Xaletê çima ew girtine?
- Xwedê bela xwe bide wan ez ji ku dizanim, hineka îftira xistiye stûyê wî, ku ev serê du mehan e ev zarok li van erdan in û ew jî girtiye.

Zarok ê mezin 13 salî ye, piştî girtina bavê xwe, lawik dest ji dibistanê berdide û li konfeksiyonekê dev bi kar di-



Zarokên Kurd, ên ku li Stenbolê dijîn bi Kurdî fêm bikin jî, zimanê wan çûye ser Tirkî û hem li derve hem jî li hundir bi hev re bi Tirkî dipeyivin...

Ferdî ye."

- Ferdî tu çima bi Kurdî nizanî?

- Ez bi Kurdî nizamim bipeyivim, lê ez fêm dikim.

- Ferdî, diya te Kurd, bavê te Kurd, dapîra te Kurd, tu Tirkî çawa fêr bûyî, yanî beriya ku tê biçî dibistanê?

Diya Ferdî got: "Birayê min beriya ku lawik here dibistanê mêvanekî dihate mala me, wek ku marîfetek be pê re bi Tirkî dipeyivî, pê şa dibû. Jixwe ku çû dibistanê îca nema bi Kurdî peyivî, niha zarok tev jî bi Kur-

Dê û bavê keçikê Kurd bûn, li gor ku keçikê digot her hefte bavê wê rojnameya Welat û her roj jî rojnameya Gündemê dixwîne. Lê mixabin keçika 11 salî jî bi Kurdî nedizaniyê. Me sedema vê yekê jî Çîmenê pirs kir. Çîmenê bi kenekî sivik pirs me wiha bersivand: "Problemeke min a fêrbûna zimanê Kurdî tune ye, ji xwe di mal de jî kes bi Kurdî qise nake. Ev çend car e ku ez ji bavê xwe rojnameya Welat dipirsim ka çi ye, tenê dibêje bi Kurdî ye.

- Tu dibêji fêrbûna Kurdî ji bo min ne problem e?

- Erê min got, lê dîsa jî ku mirov bibêje ez Kurd im divê mirov bi zimanê xwe jî bizanibe. Qey ne wisa ye?

Çîmenê keçikeke pîr bi meraq bû, lewre di vî emrî de dixwest ku her tiştî fêr bibe. Piştî ku me çend wêneyên zarokan kişandin, me jî Çîmenê pirsî ku tu mekteba xwe kuta bikî tê bibî çi?

Çîmenê: "Ezê bibim rojnamevan. Na! Na! Ezê bibim e-bûqat, an hakim an jî doktor."

- Ji van tevan tuyê bibî kîjanî?

- Ezê bibim hakim. Ji bo ez apê xwe ji hepsê xelas bikim.

- Heta hingê wê apê te di hefsê de be?

- Yok loo! Xwedê neke! Yanî ji bo ez insanen tev ji hefsan xelas bikim! (Ken...)

Çîmenê keçikeke pîr bi meraq bû, lewre di vî emrî de dixwest ku her tiştî fêr bibe. Piştî ku me çend wêneyên zarokan kişandin, me jî Çîmenê pirsî ku tu mekteba xwe kuta bikî tê bibî çi? Çîmenê: "Ezê bibim rojnamevan. Na! Na! Ezê bibim e-bûqat, an hakim an jî doktor."
- Ji van tevan tuyê bibî kîjanî?
- Ezê bibim hakim. Ji bo ez apê xwe ji hepsê xelas bikim.

ke, meha xwe jî milyonek û niv distîne. Qet nebe alîkariya mala xwe dike. Lawikê jê biçûktir jî dixebite li cem berberê, mehê bi milyonekî aboriya malê li ser milê van herdû xortan e.

Me navê lawikê mezin jê pirsî, mixabin bi Kurdî nizanibûn, bi Tirkî got: "Navê min

dî fêm dikin, lê mixabin yek jî nikare bipeyive..

Dapîra lawik jî got: "lawo wê dinya bi serê me de hilweşe. Ev panzde sal e ez li vî bajarî me, fêrî yek peyvek zimanê Tirkî nebûme. Lê neviyê min jî peyvek bi Kurdî nizanin..."

Keçikeke ciran jî li wir bû.

Erdal 5-6 salî ye. Zarokekî pîr xwînşîrîn e, dayîka wî berî bi çend mehan jê re farûnî (qaxax) yek çekiriye, farûniyê wî bi rengên kesk û sor û zer xemilî ye. Çavên wî li wênekêşa me ye û topeke naylon di destê wî de ye û çawa em çûne li me dinêre û dikene.

Me got: "Erdal çiqas farûniyê te delal e, te ji ku anî?"

Erdal: "Êêê.. bilmiyoom (nizanim)"

Diya Erdal got: "Ku wexta Erdal bixwaze farûniyê xwe li xwe bike dibêje: "Anne farûniyê min ê Apo, Apo bide min" û bi gotina xwe re jî her du pêçiyên destê çepê yên serfiraziyê bilind dike. Û de were û bikene..."

Jin, zarok, û dapîrên cîranan li mal kom bûn û ji xwe re ketine xeberdanê. Axaftina wan li ser pirsên me bûn. Em jî, ji xwe re li quncik rûniştin û me li wan guhdarî dikir.

Ev rewşa han Kurdistan anî bîra me ku etarok dihate gund, inca jinên gund li ser serê etar kom dibûn, kê tiştina ji xwe re distand, piştî li ber eşyayên etar diketin xeberdanê û dev ji etar berdidan, carina etar diçû jî, ew hê jî di xeberdanê de bûn.

**Roportaj:
Salih Günbat**



• Li ser navê ÎMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar
• Berpîrsiyarê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
• Navnîşan (Adres) Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Daire No:14 Cağaloğlu / İstanbul • Tel (fax) 511 50 07
• Nûneriya Ewropa (Avrupa Temsilciliği) Amed Tigrîs
• Navnîşan (Adres) Drakenbergsg. 63, NB. 117 41 Stockholm / Sweden • Tel (0046) 884 01 25 • Fax (0046) 884 96 35
• Çapkirin (Baskı) Yeni Asya Matbaacılık